Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1364 1-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# 'Ji ber barana zêde rewşa koçberan xerabtir bû'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Hevserokê Meclisa Kampa Serêkaniyê Ebdilrezaq Mihemed diyar kir ku daxwaza gelê Serêkaniyê vegereke bi ewle ye û wiha got: "Kampên koçberan ji ber barîna baranê dibin avê de mane û koçber bi zehmetiyan re rû bi rû ne."**





Gelê Serêkaniyê di 2019'an de ji ber êrişên dewleta Tirk û çeteyên wê û dagirkirinê bi darê zorê koçber bûn û di nava kampan de bi cih bûn. Ji wê demê û heta niha koçber gelek zehmetiyan jiyan dikin. Bi taybet di dema dawî de ji barana zêde kampa Serêkaniyê di nava avê de ma. Vê yekê jî êşa koçberan zêdetir kir.

Derbarê rewşa koçberên Serêkaniyê di kampan de û bi taybet piştî barîna pêleke zêde ji baranê, hevserokê Meclîsa Kampa Serêkaniyê Ebdilrezaq Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**'Di 2019'an de dewleta Tirk tofana xwe bi ser Serêkaniyê de anî'**

Ebdilrezaq Mihemed destnîşan kir ku di 2019'an de gelê Serêkaniyê ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê koçber bûn û wiha got: "Gelê Serêkaniyê bi awayekî aram û bi ewle di warê xwe de jiyana dikirin, lê di 2019'an de dewleta Tirk xwest ku tofana xwe bi ser Serêkaniyê de bîne, planên xwe pêkbîne û guhertina demokrafîk di Sûriyê de çêbike, ji ber vê yekê di 2019'an de bi tang û topên xwe êrişî ser Serêkaniyê û Girê Spî kir, bi hemû çekên giran bejahî û hewayî pêk hat. Di encama van êrişan de gelek sivîlan di nav wan de jin û zarok jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Ji ber van êrişên hovane yên ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve bi hezaran gel ji cih û warê xwe bi darê zorê koçber bûn û bi zehmetiya koçberiyê re rû bi rû man."

**'Koçber di kampa Serêkaniyê û Waşûkanî de bi cîh bûn'**

Ebdilrezaq Mihemed da zanîn ku 7 sal in koçberên Serêkaniyê di nava zehmetiyan de jiyan dikin û wiha domand: "Piştî ku gelê Serêkaniyê û Girê Spî di sala 2019'an de ji ber êrişên dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî bi darê zorê koçber bûn berê xwe dan hin herêmên Cizîrê û li wê derê di dibistan de bi cih bûn. Di dawiya 2019'an de ji aliyê Rêveberiya Xweser ve li bajarê Hesekê du kampên bi navê Serêkaniyê û Waşûkanî ji koçberên Girê Spî û Serêkaniyê re hatin avakirin û di destpêka sala 2020'an de ev koçber ji dibistanan hatin komkirin û derbasî van kampan kirin. Ev 7 salin ev koçber di nava van kampan de bi êş û zehmetiyên jiyanê re rû bi rû ne. Ev salên dirêj yên durketina ji warê waşûkanî ne tenê zor bû, lê hevî û hesreta vegerê, ji wê zorê mezintir re."

**'Bi barîna baranê re zehmetiyên zêdetir bûn'**

Ebdilrezaq Mihemed tekez kir ku bi barîna baranê re rewşa koçberan xerabtir bû û wiha pê de çû: "Koçberên Serêkaniyê û Girê Spî yên ku di kampan de dimînin, bi barîna baranê re zehmetiyên zêdetir bûn, av derbasî nava hemû kampan bû ev koçber di werza zivistanê a gelek sar û barana zêde de bi nexweşî û kêmaniyan re jiyan dikirin. Di demê niha de û bi taybet di van deh rojan de ji ber barîna baranê a zêde koçber bi şev û roj di nava gazinan de ne. Di heman demê de bi şev ji ber derbasbûna avê ji kampan re nikarin razin. Bi vê baranê re ji xêr û bêran ji ax û binerd re zedetir van koçberan zehmetî û alozî dîtin."

**'Gelê Serêkaniyê li benda pêkanîna peymana 29'ê Çileyê ne'**

Hevserokê meclîsa Kampa Serêkaniyê Ebdilrezaq Mihemed axaftina xwe wiha qedand: "Daxwaziya gel ya destpêkê û dawî vegereke bi ewle ye. Ji zarokê bi çûk heya kesên bi temen mezin da nava kampê de tenê xwastekek wan heya ew jî vegereke bi serbilindî ji ware xwe re ye. Ji bo vê yekê gelê Serêkaniyê û Girê Spî li benda pêkanîna peymana ku di 29'ê Çileyê di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî de hatiye îmzekirin ku benda sereke di vê peymanê de vegera bi ewle ji bo koçberan e."

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER NEFSPIÇÛKIYÊ**

**Bi piçûkan re piçûk, bi mezinan re mezin e:**
- Mirovekî pir baş e; mirovekî nefspiçûk e.
**Ji ya xwe daket:**
- Ji ya xwe hat xwarê; di dîtina xwe de israr nekir; nefspiçûkî kir.
**Ji ya xwe ket:**
- Bi heman wateyê.
**Ji xwe daxist:**
- Bi heman wateyê.
**Li xwe xwar:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BISERXWEVEÇÛNÊ**


**Danû berdan dawa sêwiyan ser pê bavê xwe çûn:**
- Bi heman wateyê.
**Dema kûçikên derê tenûran têr nan dixwin har dibin:**
- Kesê nedîtî dema rewşa wî baş dibe bitir dibe, bi ser xwe ve diçe.
**Ji xwe boriye:**
- Bitir bûye; qure bûye; ser xwe ve çûye.
**Rû dîtiye:**
- Birû ye; bi ser xwe ve çûye; bê perwerde mezin bûye.
**Yek jê re bêje ez xulam, wê misasê bixe destê wî:**
- Yek xwe jê re piçûk bike wê li stûyê wî siwar bibe; dema yek rêzê jê re digire ser xwe ve diçe; yek silavê
bidiyê wê karekî pê bide kirin.

**LI SER BISERNEKETINÊ**

**Hingî min kir û got çermê sa min firot, Osman û Qumrî min nekirin cot:**
- Dema mirov di ber tiştekî de bi taybetî di navbera du kesan de pir kedê dide û bi ser nakeve hingê tê gotin.
**Lingê min toz negirt:**
- Tiştek bi destê min neket; ez destvala hatim; ez bi ser neketim.
**Me li daholê xist:**
- Karê me pêk nehat; karê me xirab bû; karê me pelişî.
**Me li tenekeyê xist:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Amara Baran



---

## Cejina Ekîto peyamek ji bo nûjenkirinê ye




Ekîto, ango Sersala Asûrî-Babilî, cejina herî kevin a di dîroka mirovahiyê de ye, ew destpêka buharê û nûjenbûnê temsîl dike û hîn jî heta roja îro di destpêka Nîsanê de her sal tê pîrozkirin.**R-10**

## Koçberên Efrînê: Em vegereke bi ewle û jiyaneke bi rûmet dixwazin




Koçberên Efrînê dan xuyakirin ku daxwaza wan vegereke bi ewle ye û wiha gotin: "Em dixwazin vegerin bajarê xwe û jiyaneke bi rûmet bijîn." **R-7**

## Firîşte Efrîn; Xwedana dengê xweş û zelal



Hunermenda Kurd a ciwan Firîşte Efrîn tevî hemû zehmetiyên ku li pêşberî wê derketin jî huner û xwendina xwe bi hev re dewam kir, wê bi dengê xwe yê xweş û zelal hezkirina xwe di dilê civaka xwe de çand.**R-9**

## Di lihevkirinan de hikumeta Sûriyê hîn jî ji misogerkirina mafê jinê ditirse



Rêvebera Meclisa Jin a Sûrî li Qamişlo Muna Yûsif da zanîn ku hikumeta Sûriyê hîn jî li dijî hêza cihgirtina jinan di nava siyaset û leşkeriyê de ditirse û got, "Em îro behsa mafê jinê di giştî Sûriyê de dikin, xeta me ya têkoşînê jî ji bo azadî û misogeriya mafê hemû jinan e."**R-2**

## 'Divê demildest qanûn werin amadekirin û girtiyên azadiyê bên berdan'




Hevserokê TUHAY- DER a Colemêrgê Alî Bülbin diyar kir ku tevî Pêvajoya Aştiyê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dest pê kiriye, lê rewşa girtiyên siyasî di zindanan de ne baş e û her ku diçe xerabtir dibe...**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1364 1-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# RÊBER APO: PIRSGIRÊKA ME BI KOMARÊ RE NÎNE, LÊ KOMAR NE DEMOKRATÎK E

Şandeya DEM Partî derbarê civîna ku di 27'ê Adarê de bi Rêber Apo re li dar xistibû, daxuyaniyek da û naveroka peyama Rêber Apo eşkere kir. Di peyamê de Rêber Apo de da zanîn ku çareseriya entegrasyona demokratîk, nêzîkatiyeke li ser bingeha civakê esas digire. Rêber Apo tekez kir ku pirsgirêk bi komarê re nîne, mesele ew e ku komara Tirkiyê ne demokratîk e.**R-3**



## Şerê Rojhilata Navîn: Xeteriyên hevgirêdana aborî û globalîzasyonê

Di cîhaneke ewqas tevilihev de, şer êdî ne tenê li eniyên şer e, lê di nav her aboriyê û zincîreke dabînkirinê de şer bi şêwazên cuda tê meşandin û bandorê dike. Rojhilata Navîn ne tenê çavkaniyek dewlemend a enerjiyê û derfetên veberhênanê yên mezin e, lê di heman demê de hin ji zincîrên dabînkirinê û bendergehên herî girîng ên cîhanê jî dihewîne.**R-11**






**Şerê Îranê û biryara Kurdan**
Farûk Sakik R-4



**Di atmosfera heyî de tenê hêz hebûnê diparêze**
Dilyar Cizîrî R-6



**Çapemeniya ku nebe dengê civakê ji faşîzmê wêdetir diçe**
Ehmed Hesen R-7



**Zayîna Rêber Apo û Rastiya Berxwedaniya li Îmraliyê**
Gulîstan Xalid R-10

# Di lihevkirinan de hikumeta Sûriyê hîn jî ji misogerkirina mafê jinê ditirse

**Rêvebera Meclisa Jin a Sûrî li Qamişlo Muna Yûsif da zanîn ku hikumeta Sûriyê hîn jî li dijî hêza cihgirtina jinan di nava siyaset û leşkeriyê de ditirse û got, "Em îro behsa mafê jinê di giştî Sûriyê de dikin, xeta me ya têkoşînê jî ji bo azadî û misogeriya mafê hemû jinan e."**

**Esma Misṫefa/Qamişlo**

Sûriye demeke di rewşa nearamî, guhertin û ne istiqrarê de jiyan dike ku heyanî niha jî tu serkeftin û jiyan aram ji bo gelê ku bû 14 sal in di nava şer û ne istiqrarê de ne neaniye. Hikumeta demkî Sûriye yê ber bi rewşeke xirabtir ve bir ku ew jî ji rijandina xwînê re nebû bend û hê zêdetir tîyê wê bû ku bû saleke bi dehan komkujî bi serî gelan û pêkhateyên di Sûriyê de pêk anîn. Di van guhertinan de yek jê destwerdana wê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû ku xwest Rêveberiya Xwser bike hedefa xwe, lê belê bi girtina xeta Netewa Demokratîk û avakriina aştiyê, di vê yekê de bi ser neket, û rewş bi serpereştiya Rêveberiya Xweser û HSD'ê ve hat xala ku hikumeta heyî mecbûrî li ser maseya lihevkirinê rûne û mafê gelê Kurd paştguh neke.

Di entegrasyon û guhertinên ku di Sûriyê de têne qewimandin re, rewşa jina Sûrî û Kurd di van guhertinan de wê ber bi ku ve û çawa be, tê nîqaşkirin. Bi taybet hebûna jinên ku felsefeya azadiyê ji xwe re kirine bingeha jiyanê di Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hikumeta demkî ya Sûriyê li dijî azadiya jin û mafê wê ye! Girêdayî van mijaran Rêvebera Meclisa Jina



Sûrî li Qamişlo Muna Yûsif ji Rojnameya me re axivî.

**'Hebûna desthilatdariyê destê zihniyeta mêrperest bi hêz dike'**

Muna Yûsif di destpêkê de bal kişand ser rola jin di Sûriyê de û wiha got: "rewşa jin ji berê de di nava Sûriyê de ne di asta ku bikaribe bi azadî û serbest jiyan bike û nêrîna xwe bîne ser ziman. Lê belê jin bi xwesertiya xwe jiyan dikirin her jinek ji her pêkhateyekê bi azadiya xwe li gorî bawerî û ola xwe jiyan dikir. Lê jin ji siyaseta durxistinê ji cihên biryardariyê û siyasetê her tim bê par bû. Ev zihniyet di hemû civakên dersthilatdar û zayendperest de heye û zû zû nayê guhertin.

Ev rewş hê xirabtir bû bi hatina Hikumeta demki li Sûriyê re. jin ne tenê di nava qalibên civakê de winda man, di heman demê de ji hêz, îrade û xwesertiya xwe pê par man. Di her milî de ev sîstem destwerdanê li jinê dike, ji cil û bergên wê bigre heyanî xwendin, malbat û şeklê jiyana wê. Ev yek ji bilî kiryarên ne diyar yên ku li ser wê têne meşandin. Hatina vê zihniyetê li ser jinê xeter e û hêzê dide malbat û zihniyeta mêrperest ku li ser jinê hê bibe hêzeke iqtîdarê û ew jin di mal de jî bibe hebûneke bê îrade."

**Guhertina ber bi demokrasiyê ve bi misogerkirina mafê jinê pêkan dibe**

Muna di domdariya axaftina xwe de ev anî ziman: "Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ezmûna ku jinan di rêvebirina civakê de bidest xistiye, dikare bibe mînak ji hemû jinên cîhanê re û bi taybet ji hêzên ku baweriya xwe bi hebûna jin di îdarekirin û rêveberbirinê de nîne. Jinan di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ne tenê têkoşîn ji bo jinên herêmê dan meşandin, em divê bifikirin ku ji jinên cîhanê re hêza wan ya hundir raxist ber çavan ka hêza te di siyaset, leşkerî, dîplomasî û civakê de çiqas e û erka te çi ye. Bi felsefe û tecûbeya xwe hêza jinan derxist holê û xwe kirin mînak.

Di van guhertinên ku Sûriyê tê re derbas dibe de, û bi destwerdana




xwe li destkeftî û projeya Rojavayê Kurdistanê, yek ji hedefgirtinên sereke ew bû ku hêza jin di hemû qadan de tune bikin. Heya niha jî dema em bala xwe didin mijara entegrasyona ku tê kirin de, hikumeta Sûriyê hê jî li dijî hêza cihgirtina jinan di nava siyaset û leşkeriyê de ye. Gelek daxuyaniyê bi vê awayî ji aliyê Ehmed El Şeraa ve hatin dayîn. Mijara jin hê jî di nava Sûriyê de, li herêmên Rojavayê Kurdistanê de rûxmî entegrasyonê, tirsa hikumetê jê heye û bi awayekî fermî qebûl nekiriye. Xuyaye ku hikumet di vê mijarê de dudilî ye û ditirse. Ger em dixwazin guhertineke rast di Sûriyê de ber bi wekhevê û demokrasiyê ve bidin avakirin, divê di destpêkê de hikumeta Sûriyê îradeya jin ya di hemû aliyên jiyanê de paştguh neke û mafê wê bê misogerkirin."

**'Ev xeta me ya têkoşînê ye'**

Muna di dawiya axaftina xwe de yekbûna hêz û îradeya jinên Sûriyê di pêkanîna guhertinê de anî ziman û got: "Jin di giştî Sûriyê de divê bizanibin wê baweriya ku di sedsala heyî de nabe ku cihên biryardariyê bê hebûn û nêrîna jin bin. Em îro behsa mafê jinê di giştî Sûriyê de dikin û ev têkoşîn li ser azadiya jin û mafê wê hatiye destpêkirin, ji lewra ev wê biryar û xeta me ya rêxistinkirin û têkoşînê be. Em bibin artêşek jinên Sûrî li hember siyasetên durxistin û tunekirinê bisekinin, em bihêlin

# Bi tabloyên xwe hestên xwe vedibêje

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Hêvan Hemo jineke wênesaz e, ji biçûkaniya xwe ve dildara xêzkirin û wênesaziyê ye, bi rêya tabloyên xwe yên bedew hewil dide hestên xwe ji civakê re vebêje.**

Di her jiyanekê de êş, xemgînî û kêfxweşî hene. Gelek mirov bi riya van hestan wêneyan saz dikin û tê de tişta di hundirê giyanê xwe de bi riya wênesaziyê derdixin. Îro roj mirov bi riya wêneyan û herwiha bi riya wênesaziyê êşên xwe tînin ziman. Di Cîhanê de bi hezaran wênesaz hene yek ji wan jî Hêvan Hemo ye. Wê ji biçûkaniya xwe ve ji wênesaziyê hez dikir û heya ku mezin bû berdewam kir.

**Çîroka wênesaz Hêvan Hemo**

Wênesaza bi navê Hêvan Hemo ku temenê wê 29 sal e. Ew jineke ku ji bajarê Efrînê ye. Ji destpêka



ku ew biçûk bû ji wênesaziyê hez dikir heya ku mezin bû jî ew heskirina wêneyan di dilê wê de bû. Jineke ku bi helwest û hezkirina xwe wêneyan saz dike. Dema ku temenê wê 5 salî bû wê ji wênesaziyê hez dikir, ji ber hezkirina wê ji wênesaziyê malbata wê pêre bûn alîkar û wê şandin perwerdeyên wênesaziyê. Di biçûkaniya xwe de di ber jêhatîna xwe ya wênesaziyê jî Hêvan Hemo pêre dixwend û xwendina xwe berdewam dikir. Lê ya herî zêde hezkirina wê ji wênesaziyê re bêtir bû. Lê belê dixwest ku di xwendina xwe de jî serkeftî be. Hêvan Hemo ew ne tenê di malbatê de ji wênesaziyê hez dikir lê belê xuşk û birayên wê jî ji wênesaziyê hez dikirin.

**Jiyana ku qedandî**

Ji ber koçberiya wê ya bajarê Efrînê jî lê her tim hezkirina xwe ya wênesaziyê ji bîr nedikir. Hêvan Hemo ji ber ewqas koçberiyên wê jî lê wê wêneyên xwe berdewam dikir û saz dikirin. Piştî ku wê xwendina xwe ya bekeloriya bidawî kir berê xwe da Akademiya Endeziyarî ya Mîkanîk li bajarê Helebê. Demeke dirêj xwendina xwe kir û bidawî kir. Piştre Hêvan Hemo karê xwe yê wênesaziyê kir, û tevlî pêşengeha kir. Ew heya niha tevlî 6 pêşengehên cuda bûye û tê de keda xwe daye xuyakirin. Herwiha Hêvan Hemo 2 salan cihekî xwe li Helebê vekir û milet pêşwaziya wêneyên wê dikirin. Dema ku ji Helebê vegeriya berê xwe da bajarê Qamişlo û wênesaziya xwe berdewam kir. Herwiha wê demekê perwerdeya




wênesaziyê ji zarokan re vekir û wan fêrî wênesaziyê dikirin. Lê ew niha di ber wênesaziya xwe re jî karê Montajê jî dike.

Hêvan Hemo hestê di hundirê xwe de bi riya wênesaziyê derdixe. Hêvan got ku" eger kesê ji wêneyekê hez neke nikare wê wêneyê saz bike. Ji ber ku ew daxwaz û hezkirina wê ne li gorî wêneya ku dixwaze derbixe dernakeve. Herî zêde wêneyên wê li ser xemgîniyên ku di jiyana Kurdan de çêdibin saz dike. Wêneyên wê yên ku herî zêde balê dikişînê, wêneyên ku li Şêxmeqsûd komkujiyên ku çêdibûn. Ji ber ew êşa ku didît bi riya wêneyan re hestên xwe derdixist. Ew di dema pêş de naxwaze jîhatiya xwe ya wênesaziyê winda bike her tim dixwaze ku wêneyan xêz bike û di riya wêneya re buyerên ku çêdibin ji milet re bide xuyakirin.



# Şerê Rojhilata Navîn: Xeteriyên hevgirêdana aborî û globalîzasyonê

Di cîhaneke ewqas tevilihev de, şer êdî ne tenê li eniyên şer e, lê di nav her aboriyê û zincîreke dabînkirinê de şer bi şêwazên cuda tê meşandin û bandorê dike. Rojhilata Navîn ne tenê çavkaniyek dewlemend a enerjiyê û derfetên veberhênanê yên mezin e, lê di heman demê de hin ji zincîrên dabînkirinê û bendergehên herî girîng ên cîhanê jî dihewîne.

**Navenda Nûçeyan**

Di 'Serdema Nûjen' de, me gelek caran bihîstiye ku hevgirêdan û globalîzasyon dînamîkên aştî û pêşketinê ne, lê rastî berovajî wê ye, ew di demên şer de dibin sedema pirsgirêkên mezin. Li şûna pêşxistina aramiyê, ji bejewendiyan hevkarên bazirganiyê vedugherin dijber û li çar aliyê cîhanê alozî çêdibe.

Bi gotineke din, girêdana berjewndiyên aborî di navbera mirovan de û globalîzasyon dibin sedema bandorek rasterast a krîzên jeopolîtîk li ser torên bazirganî, hilberîn û darayî yên ku di destpêkê de ji bo karîgeriyê hatine avakirin lê sekna wan a ji bo derbaskirina şokan tune ye. Ji ber ku zincîrên dabînkirinê yên girîng ji ber faktorên cûrbecûr, di nav de şer û karesatên xwezayî de têk diçin, zêdebûna demkî ya bihayê dikare veguhere zextên enflasyonê yên domdar û xetera stagflasyonê zêde bike. Şeş sal berê, karesata tenduristiyê ya ku ji ber vîrusa COVID-19, çêbû, bandorên mezin ên aborî hebûn, zincîrên dabînkirinê hatin astengkirin, tengasî belav bû, aborî li çaraliyê cîhanê ket nava kirîzê û bihayên petrolê bi awayekî berbiçav daketin, ji ber ku hilberîn rawestiya û bi milyaran mirov li malê man.

**Xeteriya şer**

Di vê çarçoveyê de, şerê Îranê bandorên neyînî yên cidî yên girêdayîbûna aborî û globalîzasyonê nîşan dide, zincîrên dabînkirina hevpar




vediguherîne qelsiyan. Nakokî bûye sedema krîzeke mezin a cîhanî di ewlehiya enerjî û xwarinê de û nîşan dide ka bê istiqrariya herêmî çiqas zû dikare zirarê bide aboriya cîhanî. Her ku şerê DYA-Israîl li dijî Îranê dewam bike, bazarên darayî di dawiyê de dest pê dikin ku potansiyela ku şer bi lez veguhere krîzeke cîhanî fam bikin. Faktorên jeopolîtîk ên teqîner bi gelemperî bandorê li gelek aliyên aboriya cîhanî dikin, nemaze enflasyon û zincîrên dabînkirinê. Çîn, Hindistan û Ewropa dê di demek nêzîk de bandor bibin, bi taybetî ji ber girêdayîbûna wan a girîng bi çavkaniyên enerjiyê re. Her ku krîz dirêjtir bidome, bandora wê li ser gelek aboriyên mezin ên cîhanî ewqas mezintir dibe. Sedem eşkere ye: Rojhilata Navîn ne tenê çavkaniyek dewlemend a enerjiyê û derfetên veberhênanê yên mezin e, lê di heman demê de hin ji zincîrên dabînkirinê û bendergehên herî girîng ên cîhanê jî dihewîne.

**Tengava Hormuz û Bab-Mendeb**

Baş tê zanîn ku bender û rêyên deryayî di parastina zincîrên dabînkirina gerdûnî û domandina aboriya gerdûnî de roleke girîng dilîzin. Her wiha baş tê zanîn ku Tengava Hormuzê yek ji rêyên avê yên herî girîng ên Rojhilata Navîn e, ku rêjeyeke mezin ji petrol û gaza cîhanê tê re derbas dibe. Ji ber vê yekê, girtina an jî sînordarkirina trafîkê di tengavê de ne tenê bandorê li herêmê dike, lê di heman demê de bandorê li ser tevahiya cîhanê jî dike. Niha li Yemenê Hûsî ku hevalbendên Îranê ne ne gefan li Tengava Bab-Mendeb dixwin,

Eger Tengava Bab-Mandeb û Hormuz werin girtin dê bazirganiya cîhanî di navbera Rojhilat û Rojava de bi temamî felc bibe, herwiha ev yek dê bê guman aboriya cîhanî ber bi kirîzgeke mezin ve bibe, wê riyên dirêjtir ji bazirganiyê bên bikaranîn. Di demên berê de kêmasiyên giran ên dabînkirina petrolê ji ber bûyerên mezin çêbûne, bi taybetî Şerê Cotmehê yê 1973'an, Şoreşa Îranê ya 1979'an, destpêkirina Şerê Îran-Iraqê di 1980'an de û Şerê Kendavê yê 1990'î. Cûdahiya sereke di navbera girtina Tengava Hurmuzê û van bûyerên berê de di mezinahiya wê de ye. Rêjeya petrola ku di salên 1973 û 1990'î de ji bazarê hatiye kişandin ji sedî 6 dabînkirina petrolê ya cîhanî derbas nebû û di salên 1979 û 1980'î de ji sedî 4 derbas nebû. Lê belê, îro cîhan bi kêmasiyek nêzîkî ji sedî 20 re rû bi rû ye, ku vê bûyera jeopolîtîk JI 3 heta 5 caran girîngtir dike.

Bê guman ev rewşa heyî ya herî xeternak e, ji ber ku girtina van rêyên avê yên teng çarçoveya krîzê û bandorên wê yên gerdûnî berfireh dike, bi vî rengî pevçûnê ji pirsgirêkek herêmî vediguherîne pirsgirêkek gerdûnî. Tengava Bab-Mandeb dibe ku ji Tengava Hurmuzê jî girîngtir be, ji ber ku ew Ewropa, Asya û Afrîkayê bi rêya Kanala Suweysê bi hev ve girêdide. Ji ber vê yekê, ew bi xwezayî yek ji rêyên herî qerebalix ên keştîvaniyê yên cîhanê ye, ku ji hêla tankerên petrolê û keştîyên barhilgir ve tê bikaranîn ku ji Okyanûsa Hindî ber bi Deryaya Sor, dûv re ber bi Kanala Siwêsê, û ji wir ber bi Deryaya Spî, û berevajî ve diçin.

**Kî herî zêde ji şerê heyî sûd werdigire?**

Di nav vê krîza piralî de, Moskow îhtîmal e ku wekî sûdmendê sereke yê ji nû ve şekildana herikîna bazirganî û girêdanan derkeve holê. Guhertinên di bazarên enerjiyê yên cîhanî de ji bo rejîma Vladimir Putin pir girîng in, ku dê sûdên demkurt bi dest bixe, bi potansiyela ku ev destkeftiyên ji nişka ve mezin bibin û domdartir bibin.

Bi bilindbûna buhayên petrolê re, dahat dê biherike budceya dewletê ya Rûsyayê ya ku ji ber şerê li Ukraynayê ji ber dorpêçên cûrbecûr bargiraniyê lê kiriye. Moskow hêvî dike ku Ewropa di dawiyê de bikeve krîzeke giran a petrol û gazê, ku dikare helwesta wê ya li ser hîdrokarbonên Rûsyayê nerm bike. Ev hêvî di heman demê de li ser wê rastiyê ye ku Dewletên Yekbûyî tenê dabînkerê ku dikare alîkariya Ewropayê bi gazê bike ye, û li ser texmînan e ku Ewropa, ji ber têkiliyên transatlantîk ên xirab, dibe ku zêde girêdayîbûna xwe ya li ser dabînkirinên biha yên Amerîkî ji nû ve binirxîne, ji ber ku bihayê gaza Amerîkî ya ku ji Ewropayê re tê şandin çar caran ji ya gaza Rûsyayê bilindtir e. Ji ber vê yekê, eger Ewropa "vegere" cîranê xwe yê Rûsyayê, têkiliya di navbera Qit'eya Kevin û hevkarê wê yê Atlantîk de, ku niha Ewropayê ji hevalbend û piştgiriyekê bêtir wek barekî dibîne, dê hîn aloztir bibe.

**Wê cîhan ber bi ku ve biçe?**

Hîn jî divê were gotin ku rewş cidî ye, dibe ku ji dawiya Şerê Cîhanê yê Duyemîn vir ve ya herî cidî be. Gelek nîşan hene ku nîşan didin xirabûnek ku kes nizane çiqas e li pêşberî cîhanê ye...

# NY: Bazirganiya koleyan sûcê herî giran ê li dijî mirovahiyê

**Navenda Nûçeyan**

**Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) pêşnûme biryara ku bazirganiya koletiyê ya Atlantîkê weke "Sûcê herî giran ê li dijî mirovahiyê" pênase dike, bi piraniya dengan qebûl kir.**

Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres piştî biryarê daxuyaniyek da û diyar kir ku dewlemendiya gelek welatên Rojavayî "li ser jiyana hatiye dizîn û keda hatiye dizîn ava bûye." Guterres anî ziman ku sîstema koletiyê ne tenê xebitandina bi zorê ye û got, "Ev sîstem mekanîzmayeke mêtingeriyê ya girseyî bû ku mêr, jin û zarok bi zanebûn ji mirovûnê derdixist." Guterres diyar kir ku bi zincîran, xelekên ji hesin, qemçî û tundiya zayendî kontrol dihate ferzkirin.

Biryara navborÎ li Civaka Giştî ya Neteweyên Yekbûyî bi dengê 123 welatan hate qebûlkirin. Dewletên Yekbûyî yên Emerîka, Arjantîn û Îsraîlê li dijî biryarê deng dan. Qraliyeta Yekbûyî û welatên endamên Yekîtiya Ewropayê jî di nav de 52 welat bêalî man.


Ji lêkolînerên Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan Almaz Teffera ji BBC re axivî û anî ziman ku nîqaşa Neteweyên Yekbûyî ya li ser vê mijarê bi serê xwe gaveke siyasî ya girîng e. Teffera destnîşan kir ku ev biryar dikare tevkariyê bi pêşvebirina nîqaşên li ser tazmînatê bike.

Seroka Forûma Diaspora African a navenda xwe Gana ye Dr. Erieka Bennett ragihand ku biryar ji bo neviyên koleyan xwedî wateyeke şexsî ye. Bennett got, "Ev biryar tê wateya naskirina hebûna me. Bûyerên ku bi serê pêşiyên me hatin dawiya dawî tê qebûlkirin."

Gelên bi eslê xwe ji Efrîkayê û welatên ketin bin bandora koletiyê, bi sedan sal in daxwaza tazmînatê dikin. Ji sedsala 15'an heta bi sedsala 19'an nêzî 12 heta 15 milyon Efrîkayî; jin, mêr, zarok bi zorê birin parzemîna Emerîkayê û kirin kole. Ev mirov ji koloniyên di bin kontrola dewletên Ewropî de bûn hhatin şandin û nêzî 2 milyon ji van mirovan li keştiyên koleyan jiyana xwe ji dest dan.

Bandora koletiyê hîn jî dewam dike. Li gorî daneyên fermî li Brezîlyayê îhtimala ku nifûsa reş di nava xizaniyê de bijîn ji nifûsa yên spî bi du qatî zêdetir e.

Pêşnûmeya ku Ganayê pêşniyar kir, dixwaze ku welatên endamên Neteweyên Yekbûyî ji ber bazirganiya koletiyê lêborînê bixwazin û tevkariyê



li fona tazmînatê bikin.

Ji kesayetên pêşeng ên tevgera tazmînatê ya global Dr. Esther Xosei anî ziman ku biryar girîng e, lê belê bi tena serê xwe têrê nake. Xosei diyar kir ku ev biryar ragihandina nêtê ye, lê têkoşîna esasî di nava civakê de wê bê meşandin.

Di mijara tazmînatê de mînaka herî şênber dayina tazmînatê ji Yahûdiyên ji ber dema Nazî zerar dîtine. Elmanyayê ji sala 1952'an û vir ve zêdeyî 80 milyar dolar tazmînat da. Li gel vê yekê jî ji bo neviyên Efrîkayiyên koletî li wan hate ferzkirin heta niha dewletekê bi tenê jî tazmînat nedaye.

# Cejna Ekîto peyamek ji bo nûjenkirinê ye

Ekîto, ango Sersala Asûrî-Babilî, cejna herî kevin a di dîroka mirovahiyê de ye, ew destpêka buharê û nûjenbûnê temsîl dike û hîn jî heta roja îro di destpêka Nîsanê de her sal tê pîrozkirin.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Ekîto yek ji kevintirîn cejnên dîrokê ye, ji ber ku, kûrahiya şaristaniyên kevnar ên li Mezopotamyayê nîşan dide û wateyên hêvî û ji nû ve zayînê di nav nifşên cûda de hildigire. Her sal, ew vedigere da ku rehên wan ên kûr di şaristaniyên Mezopotamyayê de bi bîr bîne. Ew ne tenê pîrozbahiyek demsalî ye, lê belê bûyerek çandî û giyanî ye ku berdewamiya dîrokî diyar dike û girêdana mirovahiyê bi xwezayê û çerxa jiyanê ya bi hezaran salan re temsîl dike.

### Ekîto: Kokên dîrokî

Cejna Ekîto di şaristaniyên kevnar ên Mezopotamyayê de, bi taybetî di nav Babil û Asûriyan de, derketiye holê û zêdetirî çar hezar sal in tê pîrozkirin. Ev cejn bi destpêka sala çandiniyê ve girêdayî bû, ku bi hatina biharê û vegera jiyanê bo axê piştî zivistanê re hevdem bû. Pîrozkirina wê çend rojan dom dikin û rêûresmên olî û meşên cejnî di nav xwe de digirin ku têkiliya di navbera mirovahiyê û xwedayan de nîşan didin, ji ber ku mirov ji bo demsala nû bereket û berhemdariyê dixwestin. Ev cejn wekî sembola nûkirina jiyanê dihat hesibandin.

### Sembolîzm û wateyên Cejnê

Cejna Ekîto xwedî girîngiyeke kûr e ku ji statuya wê ya wekî pîrozbahiyek kevneşopî derbas dibe. Ew sembola van tiştan e: Nûjenkirin û ji nû ve zayin, serkeftina qenciyê li ser xerabiyê, destpêka çerxek jiyanek nû, ker wiha hêviya ji bo pêşerojek çêtir. Ev nirx Ekîto dikin fersendek ji bo nûjenkirina giyanê mirovan û demek ji bo vejandina kêfxweşiyê û berdewamiyê.

### Rêûresmên Kevnar ên Cejnê

Di demên kevnar de, cejna Ekîto bi rêûresmên rast û rêkûpêk dihat pîrozkirin, yên herî berbiçav ev bûn:
Meşên şahane û olî, pêşkêşkirina qurbanan di perestgehan de, xwendina nivîsên pîroz, ji nû ve nîşankirina efsaneyên afirandinê û nakokiyên di navbera xwedayan de. Padîşah beşdarî van rêûresman dibû, di dîmenekî de ku yekîtiya hêza olî û siyasî ya wê demê nîşan dida, rewatiya xwe li ber gel û xwedayan nû dikir.

### Ekîto di serdema niha de

Tevî derbasbûna bi hezaran salan, cejna Ekîto îro jî berdewam dike, bi taybetî ji hêla Asûrî, Kildanî û Suryaniyan ve li çaraliyê cîhanê. Cejn veguheriye bûyerek çandî û civakî, ku meşên gelêrî, pêşandanên hunerî û muzîkê, lixwekirina cilên gelêrî, vejandina mîrat û ziman dihewîne. Ew her wiha li bajarên cûrbecûr tê lidarxistin, ku mirov li wir dicivin da ku nasnameya xwe ya hevpar pîroz bikin.



Huner, bi rêya stran û reqsên ku di dema pîrozbahiyan de têne pêşkêş kirin, di parastina vê cejnê de roleke girîng dilîze. Muzîk wekî amûrek ji bo derbirîna kêfxweşî û aîdiyetê tê bikar anîn. Berhemên şanoyê di ji nû ve pêşkêşkirina çîrokên kevnar de jî beşdar dibin, alîkariya nifşên nû dikin ku dîroka xwe bi awayekî kêfxweş û zelal fêm bikin. Ekîto semboleke bihêz a nasnameya çandî ye, nemaze ji ber ku mirov di parastina mîrata xwe de rastî wan zehmetiyan tên. Ew fersendek e ku aîdiyet ji nû ve were piştrast kirin û girêdanên di nav civakê de xurt bibin. Bi rêya vê cejnê, nirx û kevneşopî ji nifşekî bo nifşekî din têne veguhastin, her wiha berdewamiya çandê tevî derbasbûna demê jî misoger dikin.
Bandora Ekîto bi tenê bi civatekê ve sînordar nîne, ew peyamek gerdûnî hildigire, ku jiyan bi berdewamî nû dibe, hêvî qet bi dawî nabe, mîrat bingeha pêşerojê ye û di cîhanek ku bi lez diguhere de, Ekîto girîngiya parastina rehên xwe di heman demê de hembêzkirina pêşerojê tîne bîra me. Ew hîn jî şahidiyek zindî ye ji bo mezinbûna şaristaniyên kevnar û delîlek ji bo şiyana mirovahiyê ya parastina nasnameya xwe di demê re. Ew pîrozbahiyek e ku ne tenê bi rabirdûyê ve sînordar e, lê wekî pirek ber bi pêşerojê ve dirêj dibe û di hundirê xwe de peyamek jiyan û nûjeniyê hildigire.

## Zayîna Rêber Apo û Rastiya Berxwedaniya li Îmraliyê



**Gulîstan Xalid**

Zayîn, di jiyana mirovan de, pir caran wekî destpêkekê tê dîtin. Lê hene zayînên ku ji vê têgihiştinê derbas dibin û dibin bingeha veguherînekê ya mezin. Zayîna Rêber Apo jî wisa bû; ne tenê zayîna kesekî bû, destpêka şoreşekê ya fikrî, civakî û mirovî bû ku bandora xwe li ser gelan hişt.
Ji zarokatiyê ve, Rêber Apo di nav şertên ku ne hêsan bûn de mezin bû. Ev şert, li şûna ku wî bişkînin, bûn sedema ku wî bi kûrî li jiyanê binihêre. Wî fêm kir ku jiyana rastîn tenê bi qebûlkirina şertan nayê avakirin, belkî bi pirsandin, têgihiştin û guherînê pêk tê. Ji ber vê yekê, kesayeta wî li ser bingehên azadî, hişmendî û berxwedanê ava bû.
Di nav jiyana xwe de, Rêber Apo her gav xwe nû kir. Ew ne kesek bû ku bi rewşên heyî razî bibe; belkî bi her şertê re xwe li nûkirinê û pêşketinê vekir. Ev şêwazê jiyanê, wî kir rêberek ku ne tenê xwe, gelê xwe jî diguherîne. Ew bawer kir ku ger kesayet biguherîne, civak jî dikare biguherîne.
Rastiya berxwedaniya Rêber Apo, di bingeh de, li dijî sîstema desthilatdar bû. Ev sîstem ne tenê bi zora li ser fîzîka mirov dixebitî, bi kontrolkirina hiş û fikrê jî dixwest mirovan bindest bike. Lê Rêber Apo, bi têgihiştina xwe ya kûr, fêm kir ku berxwedan divê ji hundurê mirovan dest pê bike. Ji ber vê yekê, berxwedana Rêber Apo ne tenê di qada şerê fîzîkî de bû, di qada fikrî û şuurî de jî bû.
Di vê çarçoveyê de, berxwedaniya li Îmraliyê cihê taybetî digire. Rastiya sistema li Îmraliyê, ku şertên wê pir dijwar û têkçûnkar in, ji bo gelek kesan dikare wekî dawiyekê were dîtin. Lê ji bo Rêber Apo, ev şert ne bûn dawî, bûn qada nû ya berxwedanê. Ew li wir jî berdewam kir ku xwe ava bike, bifikire û têgihiştinên xwe kûrtir bike.
Berxwedaniya li Îmraliyê, nîşana herî zelal a vê rastiyê ye ku azadî pêşî di hundurê mirovan de tê avakirin. Tecrîd û astengiyên li Îmraliyê, nekarîn kesayeta wî ya azad bişkînin. Berevajî wê, ew şert bûn sedema ku wî têgihiştinên xwe yên civakî, demokratîk û mirovî hîn jî berfireh bike. Ew li wir jî bi nivîs û fikirên xwe berxwedan kir û rê nîşan da.
Rêber Apo di vê demê de jî girîngî da civaka demokratîk ,civakek ku li ser bingehên azadî, wekhevî û hevparî tê avakirin. Ew bawer kir ku rizgariya rastîn ne tenê bi şerê derveyî tê, bi guherîna hiş û şuurê civakî pêk tê. Ev jî di şertên Îmraliyê de, bi awayekî zelal, berdewam kir.
Ji ber vê yekê, berxwedaniya li Îmraliyê ne tenê berxwedanek li dijî şertên girtiyê ye, berxwedanek e ji bo parastina kesayeteke azad. Ev berxwedan, bû nimûneyek ji bo gelek kesan ku di şertên dijwar de jî dikarin bi rûmet û azadî bisekinin.
Di encamê de, zayîna Rêber Apo bû destpêka rêyekê ku hîn jî berdewam dike. Ev rê, li ser bingehên rastiyê, berxwedanê û azadiyê hatiye avakirin. Berxwedaniya li Îmraliyê jî nîşan dide ku ev rê ne tenê li derveyî, di hundurê mirovan de jî berdewam dike.

# Projeyên ku îradeya Kurdan paşguh dike nikare bidome

**Hasan Ağaç**

Modernîteya kapîtalîst êdî ne tenê pergaleke ku krîzê dijî; ew veguheriye avahiyek ku bi berdewamî krîzê ji nû ve diafirîne. Şerên berdewam ên li Rojhilata Navîn, destwerdanên mîhwera DYA-Îsraîlê li Îranê, û aloziyên herêmî bi zelalî nîşan didin ku ev rewş ne demkî ye lê avahîsazî ye. Îro ti pêşketinên li herêmê tesadufî nînin; berevajî vê, ew encama hişmendî ya polîtîkayên "krîza kontrolkirî" ne.
Di vê çarçoveya berfirehtir de, di demekê de ku Rojhilata Navîn ji nû ve tê şekildan, rastiya ku li Rojava derdikeve holê nikare wekî pêşketineke asayî were hesibandin. Sîstema demokratîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatiye avakirin, pêşketineke dîrokî ye ku îradeya gelan a jiyana bi hev re di nav şer û parçebûnê de temsîl dike. Ev perspektîf, ku kok li ser azadiya jinan, ekolojî û demokrasiyê digire, ne tenê alternatîfek teorîk lê di heman demê de alternatîfek pratîkî jî pêşkêş dike ji bo gelek krîzên ku ji hêla modernîteya kapîtalîst ve hatine afirandin.
Lêbelê, ev yek ji mijarên herî xirab ên îroyîn e. Geşedanên li Rojava ji hêla hin derdoran ve di çarçoveyek teng de têne nîqaş kirin, ku li ser têkiliyên bi Şamê re disekinin; ew wekî ku pergala encam tenê bi îradeya hêzên derve an jî rayedarên navendî hatibe şekil kirin tê pêşkêş kirin. Lê rastî t-am berevajî vê ye. Avahiya ku li Rojava ava bûye encama rêxistina civakî, berxwedanê û îradeya gel e ku li ser erdê pêş dikeve. Têkiliyên bi Şamê re li ser bingehek hevsengiyê ya ku ji hêla vê rastiyê ve hatî destnîşankirin pêş dikevin.
Di vê nuqteyê de, pêdivî ye ku nîqaşên entegrasyonê li ser bingehek rast werin çareser kirin. Entegrasyon nayê wateya ku aliyek bi aliyek din ve girêdayî be; ew tê wateya hevsengiyek nû ku dê bi rêya naskirina hevdu ya rastiyên civakî yên cûda were çêkirin. Ji ber vê yekê, şîrovekirina pêvajoyê wekî "her tişt bi daxwaza Şamê diqewime" tê wateya hem înkarkirina rastiya li ser erdê û hem jî paşguhkirina îradeya gelê Kurd.
Yek ji stûnên herî bingehîn ên sîstema li Rojava hêza wê ya parastinê ye. Pêkhateyên ewlehiyê û hêzên parastina giştî ne tenê saziyên leşkerî ne; ew di heman demê de avahiyên ku ewlehiya jiyana civakî misoger dikin in. Hêza parastina jinan, bi taybetî ya ku bi pêşengtiya YPJ-ê de pêş ketiye, yek ji hêza herî girîng e ku karakterê vê pergalê diyar dike. Rola jinan di parastinê de ne tenê pirsgirêkek ewlehiyê ye; ew li ser kûrkirina veguherîna civakî ye.
Lêbelê, rewşa li deverên dagirkirî yên wekî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji bo çareseriyê navendî ye. Rizgarkirina van deveran û vegera nifûsê ne tenê pêdiviyek mirovî ye, lê di heman demê de ji bo yekparçeyiya sîstema demokratîk a li Rojava jî girîng e. Tu hesabên siyasî yên ku bêyî berçavgirtina vê rastiyê têne kirin dê encamên mayînde dernaxîne holê.
Îro, hemû hesabên ku li Rojhilata Navîn têne kirin, lawaziyek hevpar parve dikin: nebûna têrker a li ber çavan girtina rastiya Kurd. Lê dîsa jî, têkoşîna pêncî salên dawî Kurdan ji gelekî înkarkirî veguherandiye hêzek siyasî ya bingehîn ku bandorê li hevsengiyên herêmî dike. Modela ku li Rojava derdikeve holê, îfadeya herî berbiçav a vê veguherîna dîrokî ye.
Ji ber vê yekê, pirsgirêk ne tenê rêveberiyek herêmî an jî rêzek siyasî ya sînorkirî ye. Pirsgirêk ev e ku Rojhilata Navîn dê li ser pêşerojek çawa were avakirin. An pergalek demokratîk a li ser îradeya gel dê pêş bikeve, an jî krîz, pevçûn û bêîstîqrarî dê hîn kûrtir bibe.
Di encamê de, modela civaka demokratîk a li Rojava hatî avakirin ne tenê ceribandinek herêmî ye; ew çareseriyek berbiçav e ji bo pêşeroja Rojhilata Navîn. Ji ber vê yekê, pirsgirêk ne tenê entegrasyonê, mesele rojhilata Navinek çawa bê avakirin e. Her gavek ku bêyî naskirina vê rastiyê were avêtin dê tenê krîzê kûrtir bike.



# Rêber Apo: Çareseriya entegrasyona demokratîk nêzîkatiyeke li ser bingeha civakê esas digire

Rêber Apo da zanîn ku planeke hegemonîk li ser Rojhilata Navîn heye û got, "Çareseriya entegrasyona demokratîk nêzîkatiyeke li ser bingeha civakê esas digire, pirsgirêka me bi komarê re nîne, mesele ew e ku komara Tirkiyê ne demokratîk e."

**Navenda Nûçeyan**

Heyeta Îmraliyê ya DEM Partiyê di 27'ê Adarê de hevdîtin bi Rêber Apo re kir.
Di hevdîtinên Rêber Abdullah Ocalan li Girava Îmraliyê civînek li dar xist û di 31'ê Adarê de heyetê daxuyaniyek da û tê de nameya Rêber Apo hat belavkirin.
Nirxandinên Rêber Ocalan ên di hevdîtinê de bi kurtasî bi vî rengî bûn:

### 'Planên hegemonîk li ser Rojhilata Navîn hene'


Rêber Apo di nameya xwe de diyar kir ku planên hegemonîk li ser Rojhilata Navîn hene û got, "Divê nêzîkatiyeke teng ji vê pirsgirêka mezin re neyê nîşandan ku em hewl didin çareser bikin. Ji ber ku planên hegemonîk ên kûr li ser Rojhilata Navîn hene. Li Sûriyeyê li gel rewşa jandarî heta astekê bûyerên erênî rû didin. Niha jî şerê Îranê di rojevê de ye. Di şerê Îranê de sê xet derketine holê: Ya yekemîn; xeta Dewletên Yekbûyî yên Emerîka û Îsraîlê. Ya duyemîn; xeta parastina statukoyê ya hin hêzên navneteweyî û herêmî, ku Îngilistan serkêşiyê jê re dike. Xeta sêyemîn jî xeta jiyana hevpar û demokrasiyê ye ku bi Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk em wê diparêzin. Bûyerên li Îranê diqewimin mafdarî û girîngiya pêvajoya li Tirkiyeyê careke din raxist pêş çavan."

### 'Em çareseriya Anatolî-Mezopotamiyayê esas digirin'

Rêber Apo da zanîn ku ew çareseriyeke di çarçoveya Anatolî-Mezopotamyayê de ji xwe re dikin esas û wiha domand: "Têkiliya Anatolî-Mezopotamyayê xwedî kokên dîrokî yên kûr e. Peymana aştiyê ya mezin a yekemîn a dîrokê Peymana Kadeşê ya navbera Hîtîtan û Misiriyan de bû. Dîroka siyasî ya çar hezar salî ya li Rojhilata Navîn nîşan da ku ewlehiya Anatoliyê ji Rojhilata Navîn û Mezopotamyayê derbas dibe. Entegrasyona demokratîk tê wateya tevlîbûna çanda Mezopotamyayê weke hebûneke demokratîk."

### Pirsgirêkeke me bi komarê re nîne

Rêberê Kurd Abdullah Ocalan destnîşan kir ku pirsgirêk bi Komarê re nîne û wiha pê de çû: "Meseleya esasî ew e ku Komar ne demokratîk e. Demokrasî yekane çareserî ye ku Komarê dikare xurt bike. Bilêvkirina şaşitî, zêdegavî û antîdemokratîkbûna civakan û welatan a di demên dîrokî de divê weke destdirêjiya li pîrozmendiyê neyê dîtin. Divê were gotin, parastina rêbazên asîmîlasyonê bi baweriyeke pozîvîst, weke kirasekî teng ê li welêt hatiye kirin e. Weke ku min di banga xwe ya 27'ê Sibatê de jî got, dema têkoşîna çekdarî qediya ye. Vegera li berê êdî nepêkan e. Pêvajoya heyî pêvajoya bi Komara Demokratîk re derbasbûna li nava aştiyê ye. Ev pêvajoya ku em hêvî dikin bi ser bikeve, Komar dê du qat bihêztir be. Civaka demokratîk bi giranî bi çareseriyeke wisa ve girêdayî ye. Divê em têgihîştineke kolektîf û sivîl pêş bixin ku têkiliya di navbera Kurdan û dewletê de bi awayekî erênî saz bike. Divê dewlet jî bibîne ku tu çalakiyeke wêranker an tu gefên ewlehiyê tunene."



### 'Qadên azadiyê ne tenê ji bo Kurdan e, ji bo hemû kesan e'

Rêber Ocalan tekez kir ku qadên azadiyê ne tenê ji bo Kurdan e, lê belê ji bo her kesî ye û wiha bi lêv kir: "Beşdarbûna Komarê divê li ser bingeha nasname, azadiya fikr û ramanan, azadiya rêxistinbûnê û azadiya jinan be. Ev qadên azadiyê ne tenê ji bo Kurdan ji bo her kesî derbas dibin. Di vê xalê de ez girîngiyê didim ku bi rêbazên guncav bigihîjim tevahiya raya giştî da ku ramanên min ên derbarê pêvajoyê de bi awayekî rast bên fêmkirin."

### 'Çareseriya entegrasyona demokratîk nêzîkatiyeke li ser bingeha civakê esas digire'

Rêber Apo da zanîn ku çareseriya entegrasyona demokratîk nêzîkatiyeke li ser bingeha civakê ji xwe re dike esas û wiha bi dawî kir: "Çareseriya li ser bingeha civakê jî demokratîkbûna kolektîf û hevgirtî ya avaniyên civakî ferz dike."

# Li Sûriyê di meha Adarê de 28 kes ji ber teqîna bermayiyên şer hatin kuştin

**Navenda Nûçeyan**

**Herêmên Sûriyê şahidê zêdebûna berdewam a bûyerên teqîna mayînan û bermahiyên şer in. Di meha Adarê de li Sûriyê 28 kes ji ber teqîna mayînan û bermahiyên şer jiyana xwe ji dest dane.**

Agahiyên ku di meha Adarê de hatine belgekirin, mezinahiya karesata mirovî ya ku ji ber bermahiyên şer çêbûye eşkere dikin. Li gorî Rewangeha Mafê Mirovan a Sûriyê jimara kesên ku ji ber bermahiyên şer jiyana xwe ji dest dane wiha ye:
-Di 1'ê Adarê de, li bajarokê Um Zer li gundewarê başûrê Hesekê, zarokek ji ber teqîna mînanekê jiyana xwe ji dest da.
-Di 4'ê Adarê de, zarokek li herêma Cebel Emûr a gundewarê Humsê dema ku pez diçêrand, di encama teqîna mayînekê de hat kuştin.
-Zarokekî 11 salî piştî ku di encama teqîna mayînekê de li gundê El-Rehya yê girêdayî navçeya El-Hemra li gundewarê rojhilatê Hemayê birîndar bû, jiyana xwe ji dest da.
-Di 5'ê Adarê de, li gundê Huweys Cebel el-Belaas ê girêdayî navçeya Aqirbetê li gundewarê rojhilatê Hemayê welatiyek ji ber teqîna mayînekê jiyana xwe ji dest da.
- Di 7'ê Adarê de, ji ber teqîna du mayînên li herêma "Çiyayê Tirkmen" li gundewarê bakurê Laziqiyê, xortekî bîst salî hat kuştin û birayê wî bi giranî birîndar bû. Herwiha di heman rojê de zarokekî 14 salî ji gundê "El-Bersa" li gundewarê rojhilatê Maaret el-Numan ji ber teqîna mayinekê hat kuştin.
-Di 10'ê Adarê de, mêrekî 30 salî dema ku bi motorsîklêta xwe di wê deverê re derbas dibû, li deriyê başûrê bajarê Hesekê, di encama teqîna mayînekê ji şer dehat kuştin.
-Di 11'ê Adarê de, welatiyekî sivîl di encama teqîna mayînekê de li gundê Qeşla, ku li gundewarê bajarê Minbicê, rojhilatê Helebê ye, jiyana xwe ji dest da.
-Di 12'ê Adarê de, li gundê Qeşla yê li gundewarê bajarê Minbicê, ku dikeve rojhilatê Helebê, ji ber teqîna mayînekê zarokekî jiyana xwe ji dest da û 2 zarok jî birîndar bûn.
-Di 13'ê Adarê de, li derdora gundê El-Cebîn li gundewarê bakurê Hemayê, zarokek ji ber teqîna mayînekê jiyana xwe ji dest da û birayê wî bi giranî birîndar bû.
-Di 14'ê Adarê de, zarokek hat kuştin û hejmarek sivîl bi pileyên cûda birîndar bûn, ji ber teqîna ku li bajarê Atarib li gundewarê rojavayê Helebê qewimî. Di heman rojê de li gundê Kuzliya yê Til Temirê, di encama teqîna mayînekê de welatiyekî jiyana xwe ji dest da.
-Di 14'ê Adarê de, li herêma Cebel Tharde ya nêzîkî balafirgeha Dêra Zorê, ciwanek ji Dêra Zorê hat kuştin û çar kesên din bi pileya cuda birîndar bûn, dema ku mayînek ji şer mayî di otomobîla wan de li herêma Cebel Tharde ya nêzîkî balafirgeha Dêra Zorê teqiya.
-Di 16'ê Adarê de, welatiyek piştî ku bi şarapnelê teqîna mînan, ku bermahiyek şer e, li bakurê Hemîme el-Fayde li çola Dêra Zorê, birîndar bû, hat kuştin. Di heman rojê de li kampa Eyn Îsa ya li gundewarê Reqayê, ji ber teqîna mayînekê welatiyekî jiyana xwe ji dest da û yekî din jî bi pileya cuda birîndar bû.

-Di 17'ê Adarê de, zarokek li bajarê Palmîra yê li gundewarê Humsê ji ber teqîna bombeyeke çandî ya ji şer mayî di nav baxçeyekî nêzîkî Mizgefta El-Îman a li navenda bajêr de jiyana xwe ji dest da.
-Di 19'ê Adarê de, du xort li erdên çandiniyê li rojavayê gundê Necran, bakur-rojavayê bajarê Suweydayê, dema ku li ser traktoreke çandiniyê dixebitin, di encama teqîna mînekê de jiyana xwe ji dest dan.
-Di 21'ê Adarê de, xortek ji ber birînên giran ên ku neh roj berê, di encama teqîna mayînekê de li herêma "El-Me'alîf" a bajarê Palmyra mir.
-Di 22'ê Adarê de, du kes di encama teqîna mînanekê de, jiyana xwe ji dest dan, dema ku li rojavayê Kebaceb, başûrê bajarê Dêra Zorê, li tirufan digeriyan.
-Di 23'ê Adarê de, welatiyekî jiyana xwe ji dest da û yekî din jî bi pileya cuda birîndar bû, ji ber teqîna mayînekê ku ji şer li çola Tebnî, rojavayê Dêra Zorê, mayin mayî, bi şarapnelê ketin.
-Di 25'ê Adarê de, du welatî ji ber teqîna mînekê li ser rêya Madhul li gundewarê Dêra Zorê jiyana xwe ji dest dan.
Di 27'ê Adarê de, xortekî ji bajarokê Eyaş li gundewarê rojavayê Dêra Zorê, dema ku li çola rojavayê Dêra Zorê li tirûfan digeriya, di teqîna mînekê de, ku ji bermahiyên şer e, jiyana xwe ji dest da. Di heman rojê de, li gundê Mexalîc ê girêdayî navçeya Dêr Hefer li gundewarê rojhilatê Helebê, di encama teqîna bermahiyên şer de du welatî hatin kuştin.



# Gelo hikumeta demkî dixwaze Kembera Erebî dewam bike?

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Sûriyê welatê ku pirsgirêkên wê ji ber siyasetên kur ên dewletan nayên çareserkirin. Em ê di rapora xwe de balê bikşînin li ser siyaset û rewşa Sûriyê, bi taybet guhertin nasname û navên Kurdan an jî bi wateya rastîn paşguhkirina gelê Kurd di nava sîstema dewletê de. Guhertina navên bajar, gund û navên kesane yên Kurdan li Sûriyê, beşek ji polîtîkayên dewletên desthilatdar ên ku li Sûriyê cih girtibûn û bi roja îro re jî ev siyast tê meşandin. Bi taybet bi hatina rejîma Baas a ku di 8'ê Kanûna 2024'an de têk çû, ev polîtîka herî zêde hatibû meşandin. Armanca vê yekê ji holê rakirina nasnameya Kurdî û guhertina demografîk a herêmên Kurdî bû. Lê rejîma Baas çû û li şûna wê desthilateke nû bi destên tarî hat.

### Gelek hewldan hatin kirin ku Kurdan ji çanda herêmê dûr bixin

Gelê Kurd gelê kevnar di herêmê de ye, ji sedên salan zêdetir li ser axa Rojhilata Navîn dijîn, di tesbîtkirinên dîrokê de ew ji gelên resen ên herêmê ne. Lê gelek hewldan û asmîlasyon li ser wan hatî meşandin, da ku dîroka wan berovajî bikin û wan ji dîroka herêmê dûr bixin. Bi taybet bi îmzekirina peymanên li herêmê yan jî bi destpêkirina komployan li ser gelên herêmê û guhertina Rojhilata Navîn ber bi nexşeya nû ve, ev yek xwe da pêş.

### Kurd bi Kurdistanê tên naskirin

Berî ku em li ser paşguhkirin an jî guhertina nasnameya Kurdî li Sûriyê bikin, divê em vegerin dîrokê û hinekî behsa jiyana mirovahiyê bikin. Bi destpêkirina jiyanê re sîstemên desthilatdar an jî dewlet nebûn, lewma di wê demê de paşguhkirina mirov çi jin an jî mêr, nebû. Lê dem hat û jiyan guherî ku jiyana mirovahiyê ber bi sîstema dewletê ve çû. Qaşo dewlet li ser bingehê avakirin û hevgirtina mirovan di bin vê sîwanê de hatibû avakirin, wekî ku jêre dihat gotin. Lê mixabin "gotin nabe pratîk û pratîk jî nabe gotin" ev jî li ser erdê xwe nîşan da. Dema dewleta avabûn bi zihniyeta mêrê desthilatdar ku tenê berjewendiyên şexî ne civakî danîbû pêş çavên xwe, pêk hatin. Ji ber gelê Kurd bi avakirina dewletan re parçe parçe bûn û ji hev hatin cudakirin. Mînaka wê "Kurdistan" Kurdistana ku bi Kurdan tê naskirin, li Qesra Şêrîn û Lozan bi sînoran hatin xêzkirin û parçekirin, ev hemû li ser hesabê berjewendî û pêkanîna nexşerêya desthilatdar û dewletan bû. Li vir Kurd di nava sînorên çar dewletan de man. Li vir êdî asmîlasyona siyasî kete rola xwe ya girîng ku çawa gelê Kurd bê tunekirin, hemû dewlet bi yek zihniyetê tev geriyan û Kurd kirina armanca xwe ku wan ji dîrokê rakin, ji ber li dijî siyaseta wan dibin asteng û nikarin li gorî xwe gelên din asmîle bikin, ji ber fikrên Kurdan wekhevî, demokrasî û pirrengî ye. Ev yek têra dewletan nekir, lewra li her çar parçeyên Kurdistanê navê Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilat hatin guhertin û bûn Tirkiyê, Sûriyê, Îran û Iraqê, da ku ev dewlet bidin diyarkirin, ev ne welatên Kurdan e. Jiyana Kurdan bi vî rengî li çar aliyên Kurdistanê hate jiyankirin, lê Kurd li hemberî vê yekê ne bêdeng bûn, têkoşer û berxwedêr bûn, hem jî di encama vê siyasetê de gelek êş dîtin û bûn qurbanî, heya roja îro jî wisa li serê wan tê. Me ev mînak anî ziman, da ku em berê xwe bidin mijara xwe ya bingehî amîslasyona Kurdan li Sûriyê.

### Di nava Sûriyê de paşguhkirina Kurdan û guhertina navên wan

Dewletê rengê Sûriyê guherandin! ku ji jiyana pirrengî ber bi jiyana yekalî ve bir, bi taybet di dema rejîma Eseed de ku zêdeyî 60'î salî li ser desthilatdariyê ma, gelên Sûriyê gelek qonaxên êşê ji vê rejîmê kişandin. "Zinara Erebî" ku jêre digotin Kembera Erebî li ser Kurdan li Sûriyê hate meşandin. Rêjîma Sûriyê bi biryara (521) a sala 1974'an, zeviyên Kurdan yên di salên 1965, 1966 û 1967'an de dest danîbû ser wan ku bi dirêjahiya 272 kîlometran û kûrahiya 10 – 15 K.M (Nêzîkî 3 milyon Donim) li Erebên "Xemir" ên gundên wan di ava bendava Feratê de mabûn belav kirin. Sala 1963'an, piştî rejîma Baas desthilata Sûriyê wergirt, lêkolîna ku ji aliyê Serokê Ewlekariya Siyasî ya Hesekê yê wê demê Mihemed Teleb Hilal hatibû kirin, weke lêvegera sereke ji bo bicîkirina Zinara Erebî hilbijart. Rêjîma Sûriyê bi rêya vê projeyê hewl da demografiya Rojavayê Kurdistanê biguhere, 40 komelgeh li deverên Kurdî ji Erebên Xemir re ava kirin. Rêjîmê beşek ji projeyê bi cih kir û dest




danî ser gelek zeviyên Kurdan, ev bû sedema koçberiya bi hezaran ji Kurdan.

Herwiha tevî ev proje ji aliyê gelê Kurd ve hatibû redkirin, lê bê îradeya wan ev proje ji aliyê dewletê ve pêk hat. Gelek kesên ku ev yek red kiribûn jî hatin desteserkirin û girtin ku gelek salan di zindanên rejîmê de man û rastî işkenceyê jî hatin. Piştî derbasbûna gelek sal li ser bicîkirina Zinara Erebî, hîn jî zeviyên Kurdan ji bo wan nehatine vegerandin. Li kêlek vê yekê jî ne tenê zeviyên Kurdan ji wan hatin birin, lê navê bajar û gundên Kurdan hatin guhertin ku ji Kurdî bûn Erebî, herwiha qeydkirina navên Kurdî di nifûsên Sûriyê de qedexe bûn, an jî Kurd bê nasneme dihatin hiştin. Heya roja îro jî gelek şêniyên resen ên Sûriyê derveyî gelê Kurd, bê nasnameya Sûrî ne, ji ber li ser wan jî hatibû qedexekirin. Mînak navên bajarên Kurdan wekî Dêrik Malikiyê jêre digotin, Kobanê- Eyîn Ereb, Serêkaniyê- Rais Elyîn, Qamişlo- Qamişlî, Amûdê- Amûda û hwd… ji navên bajarên ku bi eslê xwe Kurdî ne, hatibûn guhertin.

### Kembera Erebî çi ye?

kembera Erebî ew projeyeke nijadperest û projeyeke Beisyane bû ku li Rojavayê Kurdistanê di sala 1974'an pêk hat, lê plana wê sala 1965'an hatibû dayîn. Armanca wê projeya Beasiyan, ew bû ku axa Rojavayê Kurdistanê dagir bikin û hebûna gelê Kurd a li ser axa bav û kalên wan tune bikin. Kembera Erebî berdewamiya projeya serjimêriya sala 1962'an bû ku tê de zêdetirî 120 hezar Kurd li parêzgeha Hisîçayê (Hesekê) ji mafê welatîbûnê bêpar man.

Rejîma Beasê, 4 hezar malbatên ji eşîrên Ereban ên Reqa û Tebqayê li 41 gundên Kurdan ên li parêzgeha Hisîçayê ji Dêrikê heta Serêkaniyê bi cih kirin. Ji wan Erebên ku niha di erdên Kurdan de ne, li herêmê gelek nav ji wan re tên gotin wekî Erebên Xemir, Mexmûrî û Erebên hawirde. Herwiha li her gundekî Kurdan jî muxtarekî Ereb bi destê rejîmê dihat dayîn, da ku ji xwe re tekez bikin muxtar xwediyê gunde. Hîna jî li gelek gundewarên Kurdan muxtar hene û xwe xwediyê gund dihesibînin.

### kes nikare bêheqiyê bike û heqê Kurdan bixwe

Rejîm Baas çû û hikumeta demkî ling li şûnê danî, ew jî heman nêzîkatiyê li hemberî gelê Kurd dide meşandin, ji ber niha piştî rewşa dawî ya ku li herêmê rû da, lihevkirina 29'ê Çileyê di navbera QSD'ê û vê hikumetê de hate îmzekirin, di wê lihevkirinê de xweseriya bajarên Kurdan divê were parastin û hemûban Kurdan wekî yek ji gelên bingehîn ên Sûriyê bê qebûlkirin. Lê pratîka li ser erdê berovajî vê yekê tê, ji ber hikumeta demkî ew jî bi israre ku navên bajarên Kurdan eyîn rejîma Baasê bi nav bike. Herwiha eyîn şêwaz dide meşandin, mînak ji bajarê "Kobana berxwedê" re dibêje, Eyîn El-Ereb, lê di bîlanço û serjimariyê fermî de hatine tekezkirin ku bajarê Kobanê, Efrîn û gelek bajarên din ên Kurdan e, navên wan di bingehê de Kurdî ne. Lewra di vir de jî her çiqasî ew bixwazin nasnameya Kurdan di Sûriyê de bidin guhertin, nikarin. Ji ber kes nikare bêheqiyê bike û heqê Kurdan bixwe, ger bi çi rengî be jî Kurd wê bighên mafê xwe. Ji bo wê divê hikumeta demkî ya Sûriyê di têgehên xwe de baldar be, nasnameya Kurdan hebûna wan e, ger hebûna Kurdan bê xwarin, wê demê nasnameya wan jî tê windakirin, li hemberî vê yekê jî, yek Kurd qebûl nake.



## Şerê Îranê û biryara Kurdan

**Farûk Sakik**

Şerê Rojhilata Navîn bê navber dewam dike. Di şer de eniyên nû vedibin. Her êvar herkes li benda Trump e ka wê çi peyam bide. Tu gotinek wî hev nagire. Peyamên ji hev tezat bi kar tîne. Di vî şerî de, ji hev çi dixwazin jî ne diyar e. Lê vî şerî li hemû cîhanê bandora xwe li jiyana rojane jî kir.
Li dijî şeran seknek çawa dertê pêş? Herkes peyva aştiyê derdixê pêş. Dizanin bi şer tu pirsgirêkên cîhanê nehatine çareserkirin. Şer bi xwe re wîcdanek mirovahiyê jî diafrîne. Û ev wîcdan derbasî kolanan dibe. Gelek caran jî encam digirin.
Li Amerîka û li Îsraîlê bi milyonan însan li dijî şer derketin kolanan û gotin ev şerê ku welatê me dixe bin xeteriyê were seknandin. Artêş û Polîsên Amerîka êrişê wan nekirin û destûrdan da ku mafê xwe yên demokratîk bi kar bînin. Ne bersiv dane daxwazên wan û nejî midaxele kirin. Bi tenê temaşekirin.
Em vegerin Îranê. Beriya ku şer destpêbike li serenserê Îranê xwepeşandanên girseyî hebûn. Daxwazên reforman û mafê xwe dikirin. Bersiv; Bi hezaran kes hatin qetilkirin. Lê dema ku şerê li dijî Îranê destpêkir, ev xwepeşedan rawestiyan. Normal dikaribûn rewşa defacto bikarbînin û kolanan jî wek eniyek 'maf bidestxistinê' bikarbînin. Nekirin. Du sedem hebûn. Anjî du hişmendî derdiketin pêş. Aliyek digot, me daxwazên xwe yên ji rejimê, ji bo welatê me dibin xeteriyek mezin deye, da seknandin. Anjî taloq kir.
Aliyê duyem digot, em vê rejimê baş nas dikin. Di demên asayî de bi hezaran kes qetil kiribe, di dema şer de bi deh hezaran kesî dikare qetil bike. Ji ber van sedeman kolan vala bûn.
Li Tirkiyê jî heman hişmendî heye. Li hember maf xwaza wek rejima Îranê tevdigerê. Her tim êrîşkar bûye. Di salên şerê bi Kurdan re hemû demokrat-çepgirên wan jî li kêleka hikumetê cîh girtin. Li parlementoyê li dijî Kurdan dema teskereyek-fermanek derdiket ew jî diketin pêşbirka zû îmze kirinê.
Îroj çapemeniya Tirkiyê bêsekin û bêşerm pesnê xwepeşandanên li Îsraîl û Amerîka dike.
Lê li Îranê trajediyeke mezin heye. Gelên li Îranê bedela xetayên rejima Îsamî didin. Jiyana li wêder ser û bin buye. Roj bi roj her ku diçe civak nikare pêdiviyên xwe yên însanî yên rojane tedarik bike. Herkes li benda dawî û encama şer e.
Kurd jî li benda encama şer in. Hemû amadekariyên wan ji bo encama şer hatine kirin. Di dîrokê de di germahiya şeran de biryarên ku Kurdan girtin, di encama şer de jî çi aqûbet jiyan baş tê zanîn. Komara Kurdistan, Serdema Şêx Mehmûd Berzencî, Kurdistana Sor û herî dawî şerê Sûrî de leyîskên Amerîka. Ev çend mînakên ku bi trajedî û şikestina hêviyan bi dawî bûn bû.
Ji ber vê yekê Kurdên Rojhilatê Kurdistan ji wê raboriyê dersên mezin girtî û li gor vê yekê tevdigerin. Edî Kurd der barê qedera xwe de bixwe biryaran didin û li gor vê biryarê jî tevdigerin. Di şerê Rojhilata Navîn de jî li benda encam-dawiya şerin. Li Îranê rejim were guhartin, rejima nû wê mafên Kurdan bide an na. Ewê wê demê bi staratejiyek nû têkoşîna xwe bidomînin. Heger Amerîka û Îsraîl li Îranê bibin xwedî statuyek, evcar jî wê li gorî vê guhertinê biryarek bidin. Ev biryra wan ji aliyê Rêber Apo ve jî ji nêzikte tê şopandin. Ji bo kêmasî û xetayên dîrokê neyên dubarekirin midaxele jî dike.



# Firîşte Efrîn; Xwedana dengê xweş û zelal

Hunermenda Kurd a ciwan Firîşte Efrîn tevî hemû zehmetiyên ku li pêşberî wê derketin jî huner û xwendina xwe bi hev re dewam kir, wê bi dengê xwe yê xweş û zelal hezkirina xwe di dilê civaka xwe de çand.

**Aylîn Ehmed/ Qamişlo**

Di jiyanê de gelek Hunermend bi riya stran, deng, awaz û hwd di nava civakê de xwe dane xuyakirin. Yek ji wan hunermendan jî Firîşte Efrîn ku bi deng û stranên xwe yên xweş û xemgîn deng veda.

### Jiyana Firîşte Efrîn

Firîşte Efrîn ne tenê hunermendek e, lê ew balyoza çand û dîroka xwe ye, di her tiştê ku pêşkêş dike de ruhê Efrînî û cudahiya hunerî diyar dike. Ji muzîkê xêzên ronahiyê vedihûne ku xaka zeytûnan, ba û azadiyê tîne bîra mirovan û ji bo evîn, mirovahî û berxwedanê distirîne. Ji kûrahiya çîyayên Kurdan "Hawar û Lêlûn ê" û ji bêhinxweşiya kulîlkên "Deşta Çûmê û Kefir Cenê" û henaseya Zeytûn û çîçekên hinarên "Êndara û Basûtê" û ji êşên sirgûnê, dengê Firîşta Efrîn wekî Surabayê berxwedanê hate dinyayê, ku bîrdanka welatê birîndar di dilan de geş dike. Dengê Firîşta ne tenê awazeke şehyanê bû, lê bangek niştimanperwerî bû ku ji koka xaka Kurdayetiyê derdiket û li pêşberî zordestî û dagirkeriyê wek nimêjekî bilind dibû.

### Firîşte di nav Koçberî û berdewamiya xwendin û hunerê de

Firîşte Efrîn di 2006'an de li bajarê Efrîna birîndar ji dayîk û bavekî kurd, bavê wê derhinêr, muzîkjen û helbestvanê navdar Zekeriya Efrîn û dayîka wê jî stranbêja navdar Yara Hebîb hatiye dinyayê. Firîşte dibistana seretayî ya şehîd Cemal ya li taxa Eşrefiyê li bajarê Efrînê xwendibû û piştî dagirkirina Efrînê malbata wê bi darê zorê ji bajarê Efrîna delal koçber bû û li bajarê Amûdê bi cih bû, çend mehan di dibistana amadeyî li wir xwend, paşê çû li bajarê Qamişlo xwendina xwe ya amadeyî û lîse li dibistanên Qamişlo qedand. Ew di nava malbateke hunerî û welatparêz de mezin bûye ku ji huner, stran û muzîkê hez dikirin. Firîşte ji zarokatiya xwe ve di nava atmosfera huner û stranbêjiya Kurdî ya resen de jiya ye û di pênc saliya xwe de li gel dê û bavê xwe bi stranbêjiyê dest bi karê xwe yê hunerî kiriye, li kêleka xwendina xwe, wê meyl û xwesteka xwe ya hunerî jî bikar dianî heta ku bû pîşeya wê. Firîşte piştî ku di sala 2016'an de strana xwe ya yekem bi navê "Buhare" ji gotinên bavê xwe re awaz çêkir û piştire wê hîn bêtir û kûrtir di meyl û pêşeya xwe de dest pê kir û xwe fêrî lêdana



gîtarê kir, paşê fêrî notên muzîkê û amûrên muzîkê bû. Herwiha Firîşte di sala 2017'an de dest bi beşdarbûna şahî û şevbuhêrkên çandî, hunerî û hevpeyvînên televîzyonî û medyayê kir.
Ferîşte Efrîn di sala 2019' an de yekem berhema xwe ya hunerî derxist, ew vîdiyo kilîpa strana wê "Efrîna Min" bû, ku dengvedanek di medyayê de çêkir û di nav gel de deng veda, ji ber ku êş û azarên Efrînê, koçberî, hesret û bêrîkirin axa welat nîşan dida. Ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li ser herêma Efrînê û dagirkirina wê û şert û mercên şer, xwendinê Firîşte di navbera salên 2019-2021 de ew ji stran û mûzîkê dûr ket, ew salên pir bi êş û dijwar bûn li ba wê, ji ber ku hesreta Efrîn di dilê wê de bû kulek bê derman. Piştî sala 2021'an dîsa dest bi karê xwe yê hunerî kir û kilîba xwe ya duyemîn bi navê "Nameya Penabaran" dest pê kir, dest bi beşdarbûna şevbuhêrk, çalakiyên hunerî û çandî kir, xwe bi xwe bipêşxist û di warê hunerî û stranbêjiyê de jêhatiya xwe her ku diçû xurtir dikir.
Dengê wê tevlîheviya hesret, hêzdarî, şîn û hêviyê ye, bîranîna axê hildigire û strana kurdî vedigerîne paqijiya wê ya resen, bi rêya berhemên xwe yên hunerî ku ji ciwantiya xwe ve pêşkêş dike. Di heman demê de Firîşte di sala 2023'an de beşdarî avakirina Koma Rojwar dibe û di sala 2023'an de li bajarê Qamişlo tevlî koma hunerî ya Yekparê jî dibe. Hewldanên wê yên pêşketin û afirîneriyê li vir bi dawî nebûn û heta vê kêliyê bi gotina xwe ya navdar "perwerdekirin hostatiyê çê dike" dest bi perwede, stranbêjî û hilberîna stranan dike. Hunermend Firîşte Efrîn komek stranên taybet pêşkêş kir ku hestên wê yên hestiyar û kûrbûn û girêdana wê ya ji bajarê wê re nîşan didin, berhemên bûne tekûzeka hest, hesret, bêrîkirin û mîrata kurdî ya resen.

### Stranên Ferîşte yên herî navdar

Efrîna min, Nameya Penabera, Çeleng û Bedewê û Di xew de Heştin Lorîka Min. Herwiha bi dehan stranên folklorîk û kevneşopî bi şêwazê xwe yê taybet strandin, ku dengê wê cuda kir û hişt ku nêzî wijdana gel bibe. Ew bi strana xwe ya navdar "Efrîna Min" beşdarî di belgefîlma Efrînê Evînê bû ku bi rêya wê wêneya jina Kurd a ku ji bo welat, hezkirin û bîranînê distirê diyarî kir. Firîşte Efrîn di deng û hewesa xwe de Şopên kûr ên Efrînê hildigire, di heman demê de têgehek hunerî ya bêhempa lê zêde dike ku wê ji hunermendan cuda dike mîna semboleka hezkirin, welat û afirîneriya resen. Ew ne tenê stêrkeke dibiriqîne, lê ew sembola huner û afirîneriya ku ji eslê wê yê kevnar û mîrata çandî ya dewlemend derdikeve, wê şopeke berçav di dîmena huner û stranbêjiya kurdî de hêla.
Ew niha xwendekara pola duyem a kolîjeya "Fakulteya" Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Rojava ye, li wir xwendina xwe ya akademîk li gel xebatên xwe yên hunerî didomîne û hevsengiya di navbera zanist û hunerê de diparêze û ji wêjeya Kurdî ruhê îlham û nûjeniyê di stranbêjiya xwe de digire. Fireşte Efrîn ne tenê hunermendeke zîrek e, lê ew dengê Efrîna birîndar e û sembola afirîneriya ku ji êşan radibe da ku ji bo jiyanê bistirîne, di her straneke wê de welatekî biçûk çêdibe û hêviyeke mezin di dilê gelê Kurdistanê de geş dike.

# Koma Şehîd Jiyan komake ku di hemû bernameyên xwe de çalak e

**Navenda Nûçeyan**

**Koma şehîd jiyan komeke ku di warê govend, folklor, muzîk û carinan jî di warê şanoyê de çalak e û herwiha ev kom her tim bi bernameyên xwe yên xweş tevlî şahî û fistîvalan dibin.**

Dema ku em behsa komên hunerî yên kurdî dikin, em behsa parastina nasname û çandê dikin. Di çanda kurdî de govend, muzîk û şano ne tenê huner in, lê belê nîşaneya man û nemanê ne.

### Koma şehîd Jiyan

Weke gelek komên hunerî yên li Rojavayê Kurdistanê, Koma Şehîd Jiyan ya li bajarê Qamişlo di encama Şoreşa 19'ê Tîrmiha 2012' bi pêşengtiya Tevgera Çand û Hunerê TEV-ÇAND'ê hate damezrandin. Koma şehîd Jiyan piştî sala 2012'an di dema ku saziyên çandî yên Kurdî li Qamişlo bi fermî û bi awayekî azad dest bi xebatên xwe kirin, ev kom hate avakirin. Herwiha ev Kom navê xwe ji şehîdeke şoreşê bi piranî Şehîd Jiyan Tolhildan an şehîdên bi navê Jiyan digire. Ev wekî rêzeke ji bo bîranîna têkoşeran di nava hunerê de tê dîtin. Di heman demê de ev Kom Ji bo parastina folklora Kurdî bi taybet govend û stranên herêma Cizîrê û perwerdekirina zarok û ciwanên Qamişlo di bin sîwana Navenda Mihemed Şêxo de hatiye rêxistinkirin.
Li bajarê Qamişlo, komeke taybet bi navê "Koma Şehîd Jiyan" bi piranî di çarçoveya xebatên çandî û hunerî yên şoreşgerî de tê naskirin. Ev kom li ser bingeha parastina mîrateya çandî ya Kurdî û pêşxistina hunera li herêmê hatiye avakirin. Ev kom beşeke ji Tevgera Çand û Hunera Demokratîk TEV-ÇAND'ê ya li bajarê Qamişlo ye. Koma şehîd Jiyan Xebatên xwe herî zêde li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê dimeşînin. Koma Şehîd Jiyan bi taybetî di warê govend, folklor, muzîk û carinan jî di warê şanoyê de çalak e.

### Armanca sereke ya koma şehîd jiyan

Armanca sereke ya komê zindîkirina çanda Kurdî û perwerdekirina ciwanan e. Ev kom di şevbuhêrk, festîvalên herêmî û pîrozbahiyên neteweyî weke cejina Newrozê de li Qamişlo derdikevin ser dikê. Her tim hewildanên xwe dikin da ku bernameyên xwe xweş derbixin û milet ji bernameyên wan hez bikin.
Di koma şehîd jiyan de endam bi demê re têne guhertin. Gelek endamên komê keç û kur ji bo bernameyên xwe hazir bikin li Navenda Mihemed Şêxo ya li bajarê Qamişlo perwerdeya xwe distînin. Her wiha endamên Komê ji aliyê mamosteyên pispor ên TEV-ÇAND'ê ve tê birêvebirin û perwerdekirin. Koma şehîd jiyan bi bernameyên xwe yên xweş her tim tevlî fistîval û şahiyan dibin. Kom şehîd jiyan herî zêde bi leyiztina govendên resen ên herêma Cizîrê weke Şêxanî, Baxiye û Giranî tê naskirin. Ew bi awayekî profesyonel hunera govendê diparêzin. Di hemû derketinên wan li ser dikê de, endamên komê bi cil û bergên Kurdî yên rengîn û gelerî balê dikşînin, ku ev yek nîşaneya girêdana wan a bi çandê re ye.



# Ji cûreyên mûnetê.. tirşo û bazirganiya wê li bajarê Qamişlo

Xwediyê firoşgeha tirşo Mehmûd Faris da zanîn ku anîna tirşoyê bo bajarê Qamişlo di destpêkê de serpêhatiyek bû, lê piştre bi awayekî berfireh di nava gel de hat qebûlkirin û got, “Serdanên şêniyan tevî zehmetiyên lêçûnên barkirinê yên bilind, baş e.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Bazirganiya tirşoyê (mûxelel) yek ji xwarinên demsalî ye ku li hin bajarên Sûriyê, nemaze di zivistanê û destpêka biharê de, di nava bazaran de tevgereke mezin dibîne. Li bajarê Qamişlo jî, ev bazirganî ji bo hin bazirganan wekî çavkaniyek sereke ya dahatê derketiye holê ku xwe dispêrin daxwaza herêmî ya zêde ya ji bo tirşiyên kevneşopî.

Tirşo ne tenê xwarineke duyemîn li gel xwarinên sereke ye, lê bi saya tama xwe ya taybet beşek girîng a mîrata xwaringeha cîhanê ye. Bi hezaran salan, demek dirêj berî afirandina beradeyên parastina xwarinê, mirovan ji bo parastina xwarinê bo demên dirêj trişkirin wekî rêyek bi bandor bikar dianîn û niha bi derketina rêbazên hilanîna xwarinê yên nûjen jî, tirşoyê cihê xwe di hin xwarinan de parastiye.

Derbarê bazirganiya tirşoyê li bazara Qamişlo yek froşkarên vê xwarinê ji rojnameya me re axivî.

## Serdanên şêniyan ji bo kirîna tirşoyê

Di bazara Qamişlo de, firoşkarê bi navê “Mehmûd Faris” di firoşgeheke biçûk a bi navê “El-Nekha El-Şamiyê” de dixebite, ew firoşgeheke biçûk e di pisporiya firotina tirşoyê şamî de ye, di salên dawî de di nava gelek malabtên li bajêr de ji xwarinên herî zêde tê daxwaz kirin.



Mehmûd Faris ji bajarê Helebê ye, niha li bajarê Qamişlo dijî. Projeya xwe ya bazirganî li ser anîna tirşoyê şamî bo bajêr destpê kir û wiha dibêje: “Ev fikire dema ku cara yekem derket holê ji bo bazara herêmî bi awayekî rêjeyî nû bû, lê di nav şêniyên herêmî de bi awayekî lez belav bû. Herwiha serdanên ji bo kirîna tirşoyê pir baş e, bi taybet di dema werzê wê de ku di kanûnê de destpê dike heya meha Gulanê. Ev werz wekî serdemke pir baş e ji bo kesên ku di vî warî de dixebitin, ji ber ku daxwaz li ser tirşoyê zêde dibe, ku dibin beşek sereke a sifreya rojane ya gelek malbatan.”

## Di firoşgehê de cûreyên cuda yên tirşo hene

Di firoşgeha “El-Nekha El-Şamiyê” de, cûreyên cuda û cihêreng yên tirşoyê hene, lê bi gelemperî tirşoyê berhema sereke ye ku bazirgan wekî çavkaniya xwe ya sereke ya dahatê dibînin, Faris Mehmûd wiha diyar dike: “Di firoşgehê de cureyên cuda yên tirşoyan tê pêşkêş kirin, buha li gorî cûre û kalîteyê tê guhertin.”

## Buhayên tirşoyê

Mehmûd Faris wiha dewam dike: “Buhayê piraniya cûreyên tirşoyê di firoşgehê de dighêje 20 hezarên Sûrî û tevî lêçûnên zêde yên girêdayî veguheztin û barkirina ji Şamê ji bo Qamişlo nêzî heman buhayê ku li Şamê tê firotin. Parastina vê nirxê firotinê bi zanebûn e, bi aramnca ku em parastina şiyana kirînê ya şêniyan bikin û da ku her kes karibe bikre.”

Mehmûd Faris wiha lê zêde kir: “Ji bilî vê, cûreyên din ên tirşoyan bi buhayên cuda hene, hin cûre digihîjin nêzîkî 25 hezar lîreyên Sûrî, lê cureyên bi kalîteya herî bilind bi qasî 30 hezar lîreyên Sûrî ne. Buhayê herî nizm di firoşgehê de ji bo tirşoyên xiyarê ye, ku bi qasî 12 hezar lîreyên Sûrî ye, ku ew dike yek ji berhemên herî zêde û zêdetir ji hêla şêniyan ve tê xwestin. Cûrbecûr buha û hilbirînan dibe alîkar ku pêdiviyên beşên cûda yên şêniyan werin bicîhanîn, ji ber ku hin şênî tiştên herî erzan hildibjêrin, hinek din jî tercîh dikin ku cûreyên bi kalîteya herî bilind bikirin tevî buhayê wan ê bilind.”

## Bilindbûna lêçûna barkirinê

Tevî daxwaza zêde ya li ser tirşoyan, bazirgan di karê xwe yê rojane de bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû dimîne. Di nav van zehmetiyan de ya herî derdikeve pêş de lêçûna bilind a barkirin û veguheztinê di navbera Şam û



Qamişlo de ye, ku barekî zêde dixe ser bazirganên ku di vî warî de dixebitin.

Di vî derbarî de Mehmûd Faris wiha tîne ziman: “Mesrefên barkirinê pir zêde bûne, ku rasterast bandorê li ser qezencên bazirganan dike, bi taybet eger ew hewl bidin ku bi buhayên erzan bifroşin. Ev mesrefên bilind dibe ku şiyana hin bazirganan ji bo berfirehkirina karsaziyên xwe an zêdekirina mîqdarên tirşoyên hawirdekirî sînordar, bikin. Ji bilî pirsgirêka barkirinê û gihaştina ji bo firoşgeha wî pir dijwar e, ji ber ku bazara derdorê ji çend aliyan ve bi hesin hatiye girtin, ku ji bo hin şêniyan gihîştina cihê dijwar dike.”

Mehmûd Faris wiha destnîşan dike: “Ev astengî carinan bandorê li tevgera firotanê dike, ji ber ku hin şênî neçar in ku mesafeyên dirêjtir bimeşin da ku bighêjin firoşgehê. Digel vê yekê, gelek şêniyên herêmî bi rêkûpêk serdana firoşgehê dikin da ku tirşoyan bikirin, ku bûye beşek ji sifreya wan a rojane.”

## ‘Daxwaza li ser xwarinên kevneşopî bilind e’

Mehmûd Faris wiha axaftinên xwe qedand: “Bazirganiya tirşoyan li Qamişlo xwedî derfetên mezinbûnê yên baş e eger şert û mercên veguheztinê baştir bibin û gihaştina bazarê hêsan bibe. Daxwaza ji bo hilberîn xwarinên kevneşopî, nemaze tirşoyê li bajêr zêde dimîne. Ez hêvî dikim ku di pêşerojê de bikaribim, karsaziya xwe berfireh bikim û cûrbecûr hilberên ku tê pêşkêşkirin bê zêde kirin.”

Ji ber şert û mercên aborî yên dijwar ên ku welat tê re derbas dibe, karsaziyên piçûk ên mîna firoşgeha “Al-Nekhe Al-Şamiyê” mînakek ji bo hewildanên hin kesan in, bi armanca afirandina derfetên kar û misogerkirina çavkaniyek xwedî dahatiyek sabît bi rêya bazirganiya herêmî û girêdana bi berhemên xwarinê yên ku di nav şêniyan de bi berfirehî têne pejirandin.

Ji xwe her cûreyek ji sebzeyan xwedî demsalek taybetî ji bo tirşkirinê ye. Dema hilberîna xiyarên herêmî yên guncaw ji şewender, fasûlî û behîvan cuda ye. Di meha Îlonê de, gelek xiyar û bîberên tirşkirî yên ji her cûreyî têne amadekirin, di heman demê de şewender û gêzer di zivistanê de têne tirşkirin herwiha fasûlî ku demsalên wan ji hev cuda ne, divê teze bin û bi awayekî bi tevahî saxlem werin parastin.

## Feyde û zirarên tirşoyê ji hêla tenduristî

Ji feydeyên tirşo rêxistina asta şekirê xwînê, parastina kezebê, sivikkirina nexweşî û birînên maîdeyê. Herwiha pêşîlgirtina li hin nexweşiyan e. Di heman demê de sebzeyên tirşkirî fosfor û asîda folîk dihewînin. Xiyarên tirşkirî çavkaniyek hêja ya antîoksîdan beta-karoten e. Beta-karoten bi kêmbûna rîska çend nexweşiyên kronîk ve girêdayî ye di nav de nexweşiya şekir ya cûreya dûyemîn.

Tevî gelek feydeyên wan, rêjeya xwêya bilind yek ji kêmasiyên herî mezin ên tirşoyan e. Xwarina xwêya zêde dikare bibe sedema bilindbûna tansiyona xwînê. Ji ber vê yekê, ji her kesê ku dermanên tansiyona xwînê digire an hewl dide ku vexwarina sodyûmê kêm bike tê pêşniyar kirin ku tirşoyan bi nermî bixwe an jî li vebijarkên kêm-sodyûm bigere.





# ‘Divê demildest qanûn werin amadekirin û girtiyên azadiyê bên berdan’


Hevserokê TUHAY- DER a Colemêrgê Alî Bülbin diyar kir ku tevî Pêvajoya Aştiyê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dest pê kiriye, lê rewşa girtiyên siyasî di zindanan de nebaş e û her ku diçe xerabtir dibe, lewra divê demildest ji bo girtiyên azadiyê qanûnên taybet werin amadekirin û bikevin meriyetê û got, “Azadiya Rêber Apo û berdana girtiyên siyasî, bingehê serkeftina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e.”

**Ronaz Silêman**

Tevî ku pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” li Bakurê Kurdistan û Tirkiyê dest pê kiriye jî, lê tu guhertin di rewşa girtîgehan û girtiyên siyasî de, çênebûne. Berovajî wê her ku diçe rewşa wan xerabtir dibe. Bi taybetî jî nêzîkbûna rayedaran, pêkanînên rêveberiyên girtîgehan, biryarên lijneyên çavderiyê ku berdana girtiyan asteng dike, rewşa girtîgehan radixe ber çavan. Di heman demê piştî pêşveçûna Pêvajoya Aştî û civaka demorkatîk û derbasbûna wê di milê qanûnî de, dihate çaverêkirin ku ji bo serbestberdana girtiyan li Bakur gavên qanûnî bihatana avêtin, lê heta niha tê xuyakirin ku dewlet vê yekê paşguh dike. Lê ji bo serbestberdana girtiyan pêwîst e zagonên Tikriyê bên guhertin. Ji ber weke tê zanîn serbestberdana girtiyan yek ji xalên girîng ên pêvajoyê ye, wê pêkanîna vê xalê gelek sûdê bide serxistina pêvajoyê.

Derbarê rewşa girtiyan di zindanên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de, herwiha ji bo serbestberdana girtiyan di nava Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, pêwîst e zagonên Tikriyê bi çi rengî bên guhertin, Hevserokê Komeleya Piştevaniya bi Malbatên Girtî û Hikûmxwaran re (TUHAY- DER) a Colemêrgê Alî Bülbin ji Rojnameya me re axivî.

## ‘Tecrîdek gelemper li ser hemû girtiyên azadiyê tê pêkanîn’



Alî Bülbin diyar kir ku rewşa girtiyan di nava Pêvajoya Aştiyê de, mijara sereke ye û wiha got: “Rewşa girtiyên azadiyê yên ku di zindanên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de, ji pêvajoya gelemper qut nîn e û heta gelek caran dibe mijara sereke. Ji ber ku; di feraset û polîtîkayên dewletê de, hişmendiya “girtî di destên me de ne, rehîn in û garantî ne” heye. Di demên xirab de, êrişên li hemberî zindanan dijwartir dibe, wek mînak dema ku windahî û binketinên wan çêdibe, carinan bi hovane, carinan jî pir zirav li ser girtiyan de diçin. Aliyê herî girîng jî rewşa Serokatî ye. Dema ku zor û zehmetî di zîndanan de zêde dibe, tê fêmkirin ku şert û mercên Serokatî nebaş e û rewşa gelemper di xetereyê de ye. Helbet polîtîkayên dewletê li gorî herêm, zindan û resentiya girtiyan jî, tê guhertin. Di salên 80 û 90’î de êrişên fîzîkî zêdebûn û di van salên dawî de jî, şerê taybet pêştir e. Ji bo jiyana rêxistinî xirab û belav bikin, giraniyê didin polîtîkayên mişextkirinê. Bi awayekî zirav, bi cezayên displînê, têkiliyan bi derve re qut dikin, ev jî di hêla manewiyatê de girtiyên azadiyê dide zorê. Tecrîdek gelemper li ser hemû girtiyên azadiyê tê pêkanîn. Sekna siyasî û rêxistinî, rist û mîsyona zîndanan dide pêş. Ji ber ku dewlet vê yekê baş dizane û polîtîkayên zindanan jî li gorî vê ve saz dike. Hemû pêkanînên li girtîgeha Îmraliyê, diteyîse girtigehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê.”

## ‘Derxistina qanûnan mijareke girîng e’

Alî Bülbin anî ziman ku ji bo pêvajoyê gavên Tevgera Azadiyê avêtin û diavêje li ber çavan e û wiha pê de çû: “ Pêvajoya ku ji salekê zêdetir dest pê kiriye, ne pêvajoyek hêsan e. Gavên ku Tevgera Azadiyê avêtin û diavêje li ber çavan e. Di hêla girtiyên azadiyê de, derxistina qanûnan ji bo dewletê mijareke pir girîng û zehmet e. Lewre di hemû hêzên dewletê de fikir, raman û nêzikatiyên li hember pêvajoyê ne yek e. Bi tena serê xwe derxistina qanûnan na, bi gavên berdewama wî re, ev pêvajo dê bigihîje armanca xwe. Ji ber ku ev qanûn dê bi azadbûna milîtan û welatparêzên gelê Kurd, bi hatina Gerilayan û di siyaseta demokratîk de bi cih girtina wan, watedar bibe. Helbet a herî girîng azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye. Azadiya Rêbertî destpêka Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e. Lewra derxistina van qanûnan ji bo vê pêvajoyê, mijara herî esasî ye.”

## ‘Di qanûn û makezagona Tirkiyê de mafên gelê Kurd bi tu awayî nîn e’



Alî Bülbin di dewamkirina axaftina xwe de tekez kir ku di mijara girtiyan de pêwîstî bi guhertinên bingehîn hene û wiha bilêv kir: “Weke tê zanîn di pêvajoyên beriya niha de jî, hin guhertin bi navê “3.Yargı Paketî, 4. Yargı Paketî” û hwd… çêbûn. Lê ji ber ku di van paketan de, guhertinên esasî çênebûn, bêsûd û bêwate man û negihiştin armanca ku dihat xwestin. Ji ber ku pirsgirêka Kurd rast nedihat fêmkirin û li gorî refleksên dewletê jî “formûla herî encamgir” leşkerî bû ku navê pirsgirêkan rast neyê pênasekirin, ji bo wê ne pêkan e ku tu formûl û çareserî pêş bikeve. Qanûna bi navê TMK, bi serê xwe sedema bêhiqûqiyê ye. Wek gava yekem, divê di serî de ev ji holê rabe. Li Tirkiyê pirsgirêka Kurd heye û bi vê sedemê jî gelek şoreşger û welatparêz niha di girtîgehan de ne. Hemû xebat û tevgerînên Kurdewarî di qanûnên heyî de wekî “teror” hatiye pênasekirin û li gor wê jî nêzikatî tê raberkirin. Di qanûn û makezagona Tirkiyê de mafên gelê Kurd bi tu awayî nîn e. Ji ber vê ye ku hemû xebat li derveyî zagonan e. Ev nêzîkatî pirsgirêka heyî kûrtir dike, lewre daxwaza mafên herî insanî jî, wekî sûcên giran tê dîtin û bi hêsanî tê terorîzekirin. Daxwaza mafê herî rewa, wekî perçekirina welat tê pênasekirin. Mafê siyasetê (ziman û çand jî di nav de) ji xwe demdirêjî qedexe bû û ev qedexe niha jî di gelek hêlan de berdewam dike.

Bi vê boneyê, mirov dikare tiştên ku destpêkê divê bên kirin wiha rêz bike: 1- Di qanûnan de pênasekirina statuya Rêbertî û pejirandina mafê hêviyê. 2- Girtina Girtîgeha Tîpa F ya Grava Imraliyê. 3- Rakirina TMK yê. 4- Ji bo siyaseta demokratîk, avêtina gavên hiqûqî û bingehîn.”

## ‘Gavên destpêkê yên çareseriyê berdana girtiyan e’

Alî Bülbin axaftina xwe wiha qedand: “Serbestberdana girtiyan bêguman dê bandorekî mezin li ser pêvajoyê bike. Dema mirov bi hûrgilî lê mêze dike, di hemû formûlên çareseriyan ên pirsgirêkên welatên din de jî, gavên destpêkê berdana girtiyan e. Ev yek, hem ciddiyeta aliyan dide diyarkirin, hem jî daxwaza çareseriyê raber dike. Ji ber ku bawerî, di çareserkirina pirsgirêkan de xala herî girîng e. Êca dema mijar dibe gelê Kurd an jî pirsgirêka Kurd, ji ber pêkanînên dewletê yên bi salan, baweriya gel bi dewletê nayê. Ji bo ku ev dijminahî û bêbaweriya kûr ji holê rabe, divê gavên şênber werin avêtin. Di nav van gavên şênber de jî yên herî esasî kijan bin, divê destpêkê ew gav bên avêtin û bên sepandin ku mijar pirsgêraka Kurd be jî, Girtiyên Azadiyê rastiya herî şênber e. Berdana girtiyan, dê bandora xwe ya erênî bike, bawerî û piştevaniya pêvajoyê mezintir bike. Ji ber vê jî, divê demildest ji bo girtiyên azadiyê qanûnên taybet werin amadekirin û bikevin meriyetê.”

## Alî Bülbin kî ye?

Navê min Alî Bülbin 38 salî me. Niha Hevserokê Tuhay-Der’a Colemêrgê me. Ji ber doza Kurd di dîrokên cuda de çar (4) caran hatim girtin û bi giştî 9 salan di zindanê de mam. Herî dawî di 2021’an de hatim girtin û 8 meh beriya niha hatim berdan. Niha li Geverê dijîm û Hevserokê Tuhay-Der’a Colemêrgê me.



# 'Armanca 'Rêkeftina Niştîmanî ya Kurdî' yekîtiya aliyên siyasî yên Kurdî ye'

Aram Hacî da zanîn ku armanc ji projeyê ew e ku aliyên siyasî yên Kurdî bibin yek û got, "Nexşeya vê projeyê ji şeş hêlên sereke pêktê. Zêdeyî şeş partî û tevger piştgiriyê didin projeyê."

**Hemza Sêvo**

Di 18'ê Adara 2026'ê de li Herêma Kurdistanê însiyatîfeke siyasî ya nû bi navê 'Rêkeftina Niştimanî ya Kurdî' hat ragihandin. Ji bo piştgirîdayîna doza Kurdan projeya netewî ya 'Rêkeftina Netewî ya Kurdî' hatiye destpêkirin. Ev gav jî di çarçoveya geşedanên ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe bûye rojevek li ser asta Kurdistanî. Derbarê projeya'Rêkeftina Neteweyî ya Kurdî' lêkolîner û hiqûqnasê Kurd Aram Hacî ji rojnameya me re axivî.



### 'Armanca projeyê yekîtiya aliyên siyasî yên Kurdî ye'

Aram Hacî da zanîn ku armanc ji projeyê ew e ku aliyên siyasî yên Kurdî bibin yek û wiha got: "Projeya 'Rêkeftina Neteweyî ya Kurdî' di bin dirûşmeya 'Yek Netewe, Yek Çarenûs' de daxuyanî da. Armanca projeyê di serî de yekîtiya aliyên siyasî yên Kurdî ên li herêmê ye. Proje balê dikişîne ser rewşa nearamiya li Rojhilata Navîn, herwiha bang li aliyên Kurdî dike ku nakokiyên xwe yên navxweyî bidin aliyekî û bi hev re bixebitin ji bo armanceke neteweyî ya hevpar were bidestxistin. Li gorî daxuyaniyê ezmûnên dawî yên li Kurdistanê girîngiya yekîtiyê û xurtkirina beşdarbûna di karûbarên navdewletî de nîşan dide. Dirûşma sereke ya kampanyayê 'Yek Netewe, Yek Çarenûs' e. Di destpêkê de 200 kes ji qat û pêkhateyên cuda yên herêmê beşdarî pêşnîyarkirina vê projeyê bûn û daxwaz heye ku qada beşdarbûnê ji hemû gelê Kurd zêdetir bike. Bê guman, li ser bingeha bersivên erênî yên ku me ji wan wergirtin û piştgiriya wan ji bo projeyê ev hevkarî bi fermî dest pê kir."

### 'Nexşeya vê projeyê ji şeş hêlên sereke pêktê'

Hacî destnîşan kir ku nexşerêya projeyê ji şeş hêlan pêktê û wiha domand: "Naveroka projeyê avakirina gotûbêjeke neteweyî ya hevpar e, hem jî kêmkirina nakokiyên navxweyî, balkişandina li ser berjewendiyên neteweyî, avakirina navendeke lêkolînê, pêşxistina dîplomasiyeke yekbûyî û amadekirina istratejiyên aborî û parastinê yên hevbeş e. Ev însiyatîf wek banga yekitiyê di navbera hêzên siyasî yên Kurdî de ye û hewildaneke ji bo xurtkirina rola wan li ser asta herêmî û cîhanî tê pêşkêşkirin. Em hêvî dikin ku hebûna wê ji kampanyayekê wêdetir be da ku çalakiyên din di nav projeyên neteweyî yên cuda de yên ku xizmeta daxwazên vê gotûbêjê an projeya neteweyî dikin bin. Wekî ku hat ragihandin, nexşeya vê projeyê ji şeş hêlên sereke pêktê: ya yekê bilindkirina asta yekdengiya neteweyî, ev yek jî ji bo avakirina zimanekî hevpar ku alîkariya mirovan bike, di nav aştiyê de bijîn û mafên xwe biparêzin. Ya duyem bidawîkirina nakokiyan, ango bidawîkirina nakokiyên navxweyî û baldariya li ser welatekî li ser hisabê nakokiyên siyasî. Ya sêyem pêşganiya herî girîng ew e ku danîna gel (netewe) li navenda siyasetê û dûrketina ji ramanên radîkal. Ya çarem avakirina tîmekî hevbeş ê pisporan ji bo lêkolîn û fêmkirina guhertinên li herêmê. Ya 5'an dîplomasiya yekbûyî ew jî bi rêya avakirina tîmekî yekane ji bo têkiliyan û danûstandinên bi rêberên cîhanî re. Ya 6'an çêkirina mertalê parastinê bi rêya pêşxistina planeke hevpar ji bo nehêle pirsgirêkên ewlehî û aborî bigihêjin malên gelê Kurd."

### 'Zêdeyî şeş partî û tevger piştgiriyê didin pirojeyê'

Lêkolîner Aram Hacî diyar kir ku zêdeyî şeş partî û rêxistin piştgirî dan vê projeyê û wiha axivî: "Heta niha bi fermî zêdeyî şeş partî û tevgeran piştgiriya xwe ji projeyê ragihandine û em ji bo piştgiriya wan spasên mezin dikin. Di serî de Konseya Rêveber a Komeleyên Kurdistanê wekî partiya yekem, hem jî Partiya Zahmetkeşan, Meyla Helwestan, Partiya Komunîst a Kurdistanê, Komala (Rêxistina Kurdistanê ya Partiya Komunîst a Îranê), Meclisa Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) û Yekîtiya Demokratîk Em hêvîdar in ku ev tişt di destên wan de were veguhastin bo pêkanîna miaran, helwestên siyasî û istratejîk yên neteweyî ku dikevin xizmeta gelê Kurd di vê dema girîng de ku herêm û cîhan tê re derbas dibe."

### 'Hêvî ew e ku pirojeya yekdengiyê bigihêje hemû aliyan'

Aram anî ziman ku hêvî; gihandina projeya yekdengiyê li hemû sazî û aliyên Kurdî û wiha bi dawî kir: "Bi dehan sal gelê Kurd ji bo jiyaneke azad û jiyaneke bi rûmet daxwazên xwe yên rewa têdikoşe. Em hêvî dikin ku dengvedana vê mijarê bigihêje guhê hemû hêzên xêrxwaz, çi parêzvan an jî, çi piştgiriyê didin vê doza Kurdî ya rewa û birûmet. Her çend em hêvî dikin ku ev qonax li ber çavan were girtin mijar bi demeke diyar ve ne girêdayî ye. Tiştê ku em dixwazin ew e ku em vê yekê ji alîyê hemû kesên ku di xizmeta doza Kurdî de cih digirin veguherînin helwestên netewî û ji bo derbaskirina pirsgirêkên siyasî û partîyî yên ku dijminên Kurdan her tim xeyal dikirin û ji bo berjewendiyên xwe li tevahiya parçeyên Kurdistanê bi kar bînin."



**Dilyar Cizîrî**

## Di atmosfera heyî de tenê hêz hebûnê diparêze

Şerê Amerîka-Îsraîl li dijî Îranê ev zêdeyî meheke dewam dike. Amerîka û Îsraîlê di rojên pêş de derbeyên giran li Îranê dan, bi taybet bi kuştina Şêwirmendê bilind ê Şoreşa Îranê Elî Xamînayî û hejmarek mezin a fermandar û rayedarên dewletê, ev derket lûtkeyê. Di wê demê de hemû kesên rewşê dişopîne texmîn kirin, ketina Îranê rojan e. Lê tevî êriş bi çekên pêşketî û giran pêk tê û tevî berpirs û rayedarên Îranê têne kuştin, Artêşa wê hîn li ber xwe dide. Şerê wê ne tenê di sînorê Îranê de dimeşe, lê belê pêla belavî gelek welatên herêmê kiriye.

Şerê heyî şerê hegemoniyê ye. Amerîka bi vê yekê armanc dike serweriya xwe di sedsala were de dewam bike û jêderên aboriya cîhanê di destê xwe de zeft bike. Îsraîlê jî dixwaze xwe veguhere hêzeke herî bi bandor a Rojhilata Navîn. Aliyan wiha texmîn dikirin, piştî têkçûna rêjîma Sûriyê û revandina serokê Venziwêlayê dê Îran di demeke kurt de hilweşe. Îran di heman demê de li dijî berjewendiyên Amerîka li herêmê êrişên berfireh pêk anî. Ji bilî Îsraîl li dijî Kiwêt, Behrên, Siûdî Erebistan û Qeterê êriş pêk anîn. Di heman demê de li dijî Başûrê Kurdistanê jî êriş pêk anî. Di heman demê de li Yemen, Îraq û Lubnanê baskên xwe xistin dewrê. Rewşa li Rojhilata Navîn metirsîdar e û dibe guhertin di her kêliyan de pêk werin. Bi taybet bi tevgera Heşid El Şebî li Îraqê û Huzib El Aah li Lubanê dê alozî kûrtir bibin. Diyare Amerîka dixwaze hikûmeta Ehmed El Şeri li dijî Hizib El Ah a Lubanê û Heşid El Şebî ya Îraqê bixin dewrê. Heta niha dewleta Tirk bi rê û rêbazên cûda naxwaze hikûmeta Sûriyê tevî şerê Îsraîl û Îranê bibe.

Di nerîna min de êrişa li dijî mala Serokê Herêma Başûrê Kurdistanê û êrişa li dijî bargeha Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê ya li Qesrikê têkildarî hev in. Îhtîmalek mezin destê dewleta Tirk û hin aliyên din jî tê de hebe. Armanca wan niha ew e gelê kurd careke din bixin nava şer. Di vê qonaxê de ne Îran û ne Tirkiyê naxwazin kurd ji vî şerî saxlem û bi hêz derkevin. Her çendî li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê pêvajoya Aştiyê heye, li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê peymana 29'ê Çile û mijara entegrasyonê heye, carde jî dewleta Tirk di mijara gavavêtinê de astengiyan çêdike. Diyare ew li benda encamên şerê Amerîka-Îsraîl û Îranê ye. Da li gorî wê planên xwe çêbikin.

Di rewşeke wiha de û di dema çav li ser Rojhilatê Kurdistanê ye, êriş li dijî Rojava û Başûr zêde bûye. ji lewma niha ji her demê zêdetir pêwistiya gelê kurd bi yekîtiya netewî heye. Heger di vê rewşa veguhertina li Rojhilata Navîn û cîhanê de yekîtî nebe, dê kurd nikaribin hebûna xwe biparêzin. Niha di piratîkê de sînorên di Peymanên Qesir Şêrîn û Saykis Biko de hatibûn danîn, ji holê ra dibin. Dive partiyên siyasî yên Kurd vê yekê baş binirxînin û hêza gelê kurd baş bixin dewrê.

# Ji Trump re derkeve wê bêje ez serokê Îranê me

**Reşo Mihemed**

Zêdeyî mehekê ye ku şerê Israîl-Amerîk û Îranê bi tundî didome. Di nava vê qeyrana şer de ya ku herêma Rojhilata Navîn û Kendava Erebî li ber çûye, serokê Amerîkî Donald Trump gotinên xwe yên tewşomewşo dibêje, mîna dînan diaxive, lê pişt vî maskê dînbûnê de hegemoniyeke mezin heye. Serokê DYA'yê Donald Trump di hevpevyîneke li gel rojnameya Financial Times de got vebijêrka herî baş ji bo wî bidestxistina petrola Îranê ye. Trump her wiha ji bo Girava Xargê jî îdia kir ku "gelekî bi hêsanî" dikare ji aliyê artêşa DYA'yê ve bê bidestxistin û pergala parastinê ya giravê lawaz e. Çavdêran hişyarî da ku ji ber girîngiya wê ya stratejîk, her hewla kontrolkirina giravê dibe bibe sedema şerekî mezin û zêdebûna hejmara qurbaniyan. Girava Xargê ya Îranê ku li bakurê Kendavê ye, xwedî termînala bingehîn a welêt e ku ji sedî 90'ê firtoina petrola xav lê tê kirin. Ji van axafitinên Trump tekez diyar dibe ku armanca wî ya sereke fetisandina Îranê ye, radestkirina çend kesayetên rêjîma heyî ye. Wekî tê zanîn mijara şer û derdê Amerîka ji vê tevlîheviyê mijara aboriyê ye. Trump dibêje bidestxistina petrola Îranê vebijêrkeke herî baş e, wiha mirov dikar pênase bike ku Amerîka serweriya cîhanê bi giştî di destê wê de ye, êdî xwe mafdar dibîne ku destwerdanê di hemû welatan de bike. Ev ceberûta ku Amerîka xwe di siya wê de derdixe pêş rêbazek ji meşandina Şerê Taybet e. Her tim xwe weke pêşenga cîhanê dihesibîne û ji vê yekê dixwaze bandora li hemû welatên cîhanê bike. Çawa ku serokê Venezuela ji hêla Amrîka ve hate desteserkirin, niha jî Trump dixwaze hikumeteke li gorî xwe saz bike, dixwaze rêjîma Îranê têkbibe û kesayetekî nûnertiya rêjîmeke nû bike, deyne ser hukim. Donald Trump niha xwe weke serokê Venzuelayê yê demkî dihesbîne, jê re derkeve ew ê bibêje ez serokê Îranê me, tenê ji bo ku serweriya xwe li ser Îranê ferz bike û rêjîma wê ya milayî ya qirker lawaz bike da ku xwe radest bike.

Berî niha, Trump ji CNN re got Îran soz daye ku çekên nukelerî li cem xwe nehêle. Donald Trump îdîa kir ku di dema şer de li Îranê guhertina rejîmê pêkhatiye. Trump ji rojnamevanan re got: "Eger hûn li rewşa niha binêrin, guhertina rejîmê pêkhat, ji ber ku rejîma berê hate hilweşandin û pêşengên wê rêjîmê hemû hatin kuştin." Wî got: "Rejîma din bi temamî bi dawî bû û ji bo rejîma sêyem, em bi mirovên cuda re mijûl dibin ji yên ku berê pê re mijûl bûne, cudatir e. Ji ber vê yekê ez difikirim ku guhertina rejîmê pêkan bûye û bi rastî ew pir aqilmend in." Eger rast be ku weke Trump dibêje rêjîma Îranê hilweşiyabe, gelo çima heta niha êriş li ser bargeh, sazî, balyozxane û cihên cuda yên Amrîkî li herêmê, herwiha Israîlê têne domandin? Bi rengê ku Amerîka û Israîl xeyal dikin Rêjîm nayê guhertin, bi agirê şoreşa gelên Îran û Rojhilatê Kurdistanê rêjîm hildiweşe. Rêjîmeke sistemkar û qirker weke Îran ku gelên xwe di krîza aborî re derbas dikir, ew îşkence dikir û bi hezaran kes dikuştin, hem jî bi dar ve dikirin, hişt gel berî 4 mehan rabe ser piyan û têbikoşe. Têkoşîna gelan a ku hat destpêkirin ew mifteya çareseriyê bû ji bo hilweşandina rêjîmê û xelasiya gel ji xeteriya çekên nukelerî li ser gelên Îran, Rojhilatê Kurdistanê û tevahiya gelên herêmê. Lê Amerîka, Israîl û tevahiya hêzên herêmî ev şoreş paşguh kirin, tenê ji bo berjewendiyên xwe tevgeriyan, ji ber vê yekê em dibînin ku şer û tevlîhevî berdewam e.



# Koçberên Efrînê: Em vegereke bi ewle û jiyaneke bi rûmet dixwazin

Koçberên Efrînê dan xuyakirin ku daxwaza wan vegereke bi ewle ye û wiha gotin:"Em dixwazin vegerin bajarê xwe û jiyaneke bi rûmet bijîn."



Sebah Elo



Jiyan Hisên



Emîna Hemo



Nisrîn Silêman

**Navenda Nûçeyan**

Di Adara 2026'an de, piştî 8 salan ji koçberiya bi darê zorê, pêvajoya vegera koçberên Efrînê ji herêmên wekî Şehba û Cizîrê bi awayekî fermî dest pê kiriye. Ev yek di encama peymaneke di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk HSD'ê û rêveberiya nû ya li Şamê de bi hevkariya hin aliyên navneteweyî pêk hat. Niha jî koçberên ku di dibistanên kantona Cizîrê de dimînin daxwaza vegera bajarê xwe yê Efrînê dikin.

Di derbarê mijarê de Koçberên Efrînê û Rêveberiya hevbeş a kantona Efrînê ji Rojnameya me re axivîn.

### 'Daxwaza me vegereke bi ewle ye'

Koçbera bi nave Sebah Elo da diyarkirin ku ew dixwazin bi ewle vegerin Efrînê û wiha got: "Ev bû 14' de sal ku her tim em Koçber dibin. Gerek bajarê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî bi ewle bibe da ku tevahî koçber vegerin cih û warên xwe. Heya niha li van bajaran hîna çete li wir bicihbûyî ne. Îro em dixwazin dema ku vegerin hêzên me bi me re vegerin Efrînê ji bo parastina me. Ger îro bajar ne bi ewle bin em nikarin vegerin cih û warê xwe, divabê heya ku em vegerin bajar bi ewle be, da ku em jiyana xwe li wir berdewam bikin. Em pir ji axa xwe ya Efrîn hez dikin lê em naxwazin dema ku biçin Efrînê bikevin bin desthilatdariyê. Tenê em jiyaneke bi ewle li ser xaka welatê xwe dixwazin."

### 'Divê ewlehî hebe heya ku em bi dilekî rihet jiyan bikin'

Koçbera bi nave Jiyan Hisên jî bal kişand li ser vegera li ser xaka xwe û wiha got: "Ev bû demek ku em di dibistanên bajarê Qamişlo de jiyan dikin. Ji hemû aliyan ve em astengiyan dikşînin. Ji ber wê tenê daxwaza me vegereke birûmet û bi ewle ye ku em vegerin bajarê xwe yên ku bi sedê salan tê de jiyan dikir. Weke ku em dizanin jî niha malên me hatine wêrankirin. Lê tenê me dixwest ku em li ser axa bajarê xwe jiyan bikin. Piştî çûyîna hin koçberan li bajarê xwe yê Efrînê me jî xwest ku em vegerin û jiyaneke xweş jiyan bikin. Lê niha me dît rewşên ku li wir çêdibin di navbera Hikûmeta Sûrî û xelkên me yên bajarê Efrînê de. Dema ku em dîmenên bi êş yên Hikûmeta Sûrî li ser xelkên me yên Efrînê dibînin daxwaza vegerê li ba me dibe bi êş. Em dixwazin dema ku em vegerin cih û warê xwe gerek ewlehî hebe heya ku em bi dilekî rihet jiyan bikin."

### Tevî zehmetiyan jî lê daxwaza vegerê heye

Koçbera bi nave Emîna Hemo da zanîn ku tevî zehmetiyan jî lê ew dixwazin vegerin bajarê xwe yê Efrînê û wiha got: "Me pir di koçberiyê de zehmetî kişandin. Em tenê dixwazin vegerin ser axa xwe êdî bese evqas zehmetî. Weke em dizanin jî ku Efrîn dibin destê Hikûmeta Sûriyê û xelkên ku li wir jiyan dikin de ye, lê ji ber wê jî em dixwazin vegerin. Ji ber ku îro em di dibistanan de herî zêde zehmetiyên jiyanî dikşînin. Ger îro veger çê be em ê vegerin Efrînê."

### 'Yekîneyên xanîyan Ji bo koçberên hatine peyda kirin'

Di heman çarçoveyê de rêveberiya hevbeş a Kantona Efrînê Nisrîn Silêman axivî û wiha got: "Ji bo kesên ku vedigerin Efrîn ê, ne hemû rewş wek hev in. Hin ji wan xaniyên wan hewceyî tamîrkirinê ne, hinên din jî heta ku xanîyên wan amade bibin û karibin xaniyan peyda bikin li cem xizmên xwe mane. Ji bo hejmareke hindik ji malbatên ku hîn nehatine bicihkirin, yekîneyên xanîyan hatine peyda kirin. Bi gelemperî, me tu binpêkirinên li dijî malbatên ku vedigerin Efrîn nebihîstiye.


Her wiha, malbatên ku vedigerin Efrîn di hemû astan de hewceyî piştgiriya darayî û lojîstîkî ne. Vegera piştî zêdetirî heşt salan ji koçberiyê û jiyana di şert û mercên dijwar de bûye sedema ku ev malbat tu derfetên debara xwe nebînin."

### 'Koçber bi biryarin ku vegerin gund û taxên xwe'

Nisrîn di dawiya axaftina xwe de bal kişand li ser mal û milkên koçberan li Efrînê û wiha got: "Tevî hebûna encumenekê li Efrîn û hebûna hêzên ewlehiyê yên giştî, gelek pirsgirêk hîn jî nehatine çareserkirin. Ji bo nimûne, pirsgirêka malên ku hîn jî ji hêla kesên ku piştî dagirkirina Efrîn ketine ve têne bikaranîn, mirovên ji Dêra Zorê, Idlibê, Hemayê û deverên din nehatiye çareserkirin. Ev mal têne valakirin, û rewşên zorê û derxistina bi zorê li hember pereyan hene. Heta erd, milk û dikan jî nehatine vegerandin xwediyên wan ên resen, niştecihên vegeriyayî yên Efrîn ê. Wekî din, gelek niştecihên Efrînî yên ku qet Efrîn bernedane an jî berê vegeriyane nikarin milkên xwe vegerînin, ji ber ku niştecîhên van malan pir caran leşkerên ji komên El-Emşat û El-Hemzat in. Tevî van hemû şert û mercan, niştecihên Efrînî yên ku niha li deverên di bin Rêveberiya Xweser de dijîn, bi biryar in ku vegerin gund û taxên xwe yên li bajarê Efrîn."



**Bîra Civakê**



**Ehmed Hesen**

## Çapemeniya ku nebe dengê civakê ji faşîzmê wêdetir diçe

Di rastiya her civakekê de neynikeke nûnertîya heqîqetan heye, yek ji wan neynikan jî dengê ragihandin û çapemeniyê ye, di dîroka dengê ragihandinê de damarên kûr hene ku hiştine çapemenî li gorî şert û mercên civakê yên dîrokî were meşandin, ragihandin di koka xwe de ne tenê komkirina hinek agahî di derbarê bûyerekê de û weşandina wan agahiyan e, ji wê zêdetir ew hêza rasteqîn a şopandina heqîqeta civakî ya bîrdozî, dîrokî, çandî û zanistî ye, her wiha danîna pilana veguhestina van rastiyan bi awayekî rasteqînî ku bi pîvanên dilsoziyê re li hev dike. Di heman demê de ji yekalîtiyê dûr e û nabe ku di bin serweriya komeke diyar an otorîteyeke taybet de were xebitandin, ji ber ku di encamê de wê ji ragihandinê wêdetir bibe objeyeke ji hev ketî û dubarekirinê di nava xwe de jiyan bike, di heman demê de binpêkirina pîvanên civakî yên netewî di bin çi şert û mercan de dibin, nabe ku bibin mijara provakasyonan, li cihê ku dewlet û otorîte serwer bin, li wir rastiya çapemeniyê û mafê azadiyan hatiye peritandin û paşguhkirin, ji ber ku hingê rastiya ku çapemenî biweşîne, wê ji sînorên hişmendiya otorîteyê serdest ne zêdetir bibe. Lewma jî otorîte dikare bi riya çapemeniyê bi hêsanî qadên şerê taybet mezintir û firehtir bike. Di dîroka şerên sedsala 20 û 21an de çapemeniya hêzên hegemonîk bi rihetî karîn bikaranîna çekên nûkleer, kîmyewî û tunekirina civak û hewirdorên welatan rewa bikin û di aliyê psîkolojîk de civakan qir bikin, taybet di şerên Iraq a 2003, komkujiya Helebçe, ketina Emerîka ya Efganistanê heta dagirkirina Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî ji aliyê dewleta Tirk û komên girêdayî wê ve, çapemeniya şerê taybet û hemû malper û qenatên fermî yên hêzên dijber li hember qirkirina gelan, kuştina kurdan û dagirkirina welatan bi awayekî herî xirab propogandayên rewakirina van şeran lîstin û li dijî gelan sorkirin pêk anîn. Li bakurê Kurdistanê taybet bi zimanê gel propogandaya rewakirina şewitandina gundên kurdan dane kirin, taybet TRT6 bi zimanê kurdî roleke mezin di teşhîrkirin û sorkirina li dijî kurdan de lîst, her wisa gelek malper û ragihandinên ku bi zimanê kurdî xizmetê ji dagirkeriyê re dikin roleke neyînî ya mezin di teşhîrkirina dagirkirina herêmên kurdan de lîstin. Ev yek di bin serpereştiya polîtîkayeke zirav a şerê taybet ê aliyên dijber de tê bicihanîn û li ser wê karekî herî xeternak di parçekirina civakê de tê kirin, bi vê yekê armanc dikin ku raya giştî ya gel bixapînin, moralên civakê bişkînin û hemû sazî û aliyên têkildarî civakê li pêş çavên wê civakê reş bikin, di roja îro de jî taybet malper û rayedarên girêdayî hikûmeta demkî ya Sûriye û dewleta Tirk li dijî pêkhateya Durzî, Elewî û Kurdan propogandayên herî xirab ên reşkirin û derxistina fitneyan dikin, bi vê yekê hem dixwazin komkujiyên li dijî wan rewa bikin, hem jî wan ji mafên wan bêpar bihêlin. Çawa ku beriya wan rêjîma Esed bi riya qenalên xwe ev yek dikir, niha jî bi heman ferasetê hikûmeta demkî vê yekê dike.